



## Heke jin hewl bide

Li cîhanê gelek mirovên wisa hene ku bêyî biaxivin, bibihîzin û bibînin bi têkoşîn û hewldanên xwe ji mirovan re dibin îlham. Yek ji wan kesan jî pedagoga amerîkî jîna bi navê Hellen Keller e. Tiştê ku Keller jî pedagogên din cuda dikir korbûn, nebihîstin û lalbûna wê bû... *R.2*



## Di edebiyatê de alegorî

Ne cihê nîqaşê ye ku edebiyata kurdî wek edebiyateka dij û postkolonyal derketîye ser dikê edebiyata cîhanê û hê jî li ser dijkolonyaliya edebiyata kurdî tê nivîsandin. Hebûna alegoriya neteweyî di nav vegêranên bi kurdî da ne cihê şaşwaziyê ye... *Qobad İnxan / R.5*



## Guman û bîr

Filozofî bi gumanê dest pê dike. Ên ji tu tiştî guman nakin, hewcedariya wan bi filozofiyê jî tune ye. Hemû pergala û paradîgamyên wek ol, îdeolojî, zanistî jî béguman bi gumanê dest pê kiriye. İbrahîmî jî piroziya Nemrûdî guman nekira, belkî wan olên sereke... *Helim Barin / R.8*

Rojnameya  
Heftane

www.xwebun.org

# xwebûn

22 - 28 Heziran 2020

Hejmar: 27

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

## Ji bo zarokan rojnivîska Xecê

Nivîskar Yasemîn Elban ji bo zarokan seta ku ji 5 pirtûkan pêk tê amade kir û Weşanxaneyê Darayê set weşand. Rojnivîska Xecê, 'Xecê li dû Derwêşê Evdî ye, Xecê li dû Mesture Xanimê ye, Xecê li dû Evdalê Zeynikê ye, Xecê li dû Celadet Alî Bedîrxan e.' Yasemîn Elban diyar kir ku berê xwe daye nivîsina çîrokên ku zarok paşeroja xwe û navdarên xwe bi wan nas bikin... *RÛPEL - 9*

## Ji bo pêşerojê demokratîk meşîyan

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) partiya sêyemîn a Tirkiyeyê ye û ji ber polîtîkayên xwe her tim wek hedefên nîşandan. Bi dehan caran xebatkar, endam, rêveber, hevserok, hevşaredar, parlamenterên wê hatin girtin. Desthilatê qeyûm tayînî 45 şaredariyên HDP'ê kirin û parlamenteriya Leyla Guven û Mûsa Fa-

risogullari betal kir. Bi hezaran HDP'î di girtîgehan de ne. HDP ligel zext û astengiyên "Li dijî darbeyê meşa demokrasiyê" li dar xist. Ji Colemêrg û Edîrneyê heta Enqereyê meşîyan û xwestin bibin dengê gel, kedkar, karker, xizan û bêkarên. Ligel meşa ku hat destpêkirin mijarên di belgeya HDP'ê de jî girîng bûn... *RÛPEL - 7*

## BERTEK ZÊDE DIBIN

### Êrîş bû sedema krîzê

Dewletê careke din serî li rêya ku gelek caran serî lê daye, da û piştî 12 salan bi hêzeke mezin li dijî başûrê Kurdistanê êrîşeke leşkerî pêk anî. Herî dawî dewletê di sala 2008'an de serî li vê rêyê dabû û piştî êrîşên 8 rojan vekîşiyabû... *R.3*

# Ber bi yekitiyê ve

## Rabirdûya balîfekî

Balîf amûrekî wisa ye ku di jiyana mirov de cihê gelek girîng digire. Bi qasî kincên li ser mirov nebin jî balîf jî şahidiya beşeke mezin a jiyana mirov dikin. Bi roj weke stûnekê ji mirov re dibin piştê û bi şev jî dibin barhilgirê giraniya ser, xewn û xeyalên mirov. Mîna kamêra û wênegirekê jiyana mirov resm û qeyd dikin û bi qasî dengirekê jî guhdariya fikir û xeyalên mirov dikin. Lê ji ber ku zimanê wan tune... *Qedri Esen / R. 3*



Di dîroka nêz de, nêzî 40 sal in 'Yekitiya Neteweyî' di rojê xwe de gelekê kurd de ye. Heta niha berhevî û serpêhatîyeke baş jî çêbûye. Li bakurê Kurdistanê heta astekê tifaqek di nav hêzên kurdî de çêbûye. Li rojhilatê Kurdistanê jî bi heman awayî di navbera hêzên kurdî de tifaqek bi vî awayî ya pratîkî çêbûye. Li başûrê Kurdistanê ev demeke dirêj e ev xebatên kirin. Li rojavayê Kurdistanê aliyên kurdî li ser xalên esasî li hev kirin...

Mem Avba / RÛPEL - 6

## Averşiyîşî ma rê çî ard

Nuştox Yuval Noah Harari kitabê xê yê Homo Deusî de vano ke "heta na seserra peyênê hîrê problemê eslî her tim biyê belayê sereyê merdimîye: xela, jan (nêweşiyê ke vila benê) û ceng." Ez do bi çend cumleyan nînan ser o vîndera. Beno ke neslê neweyî xela nêdîyo la ez bawer kena ke ma zaf pê hesiyayê. Xela hukmêdê pîlî şarî ser o ronayo, ziwani de gelekî îdîyoman de yan zî qaliban de ca girewto... *Serhat Kiliç / R.9*

## Aliyê tirk pêvajoyê dixitimîne... Felemez Ulug / RÛPEL - 3



## Koçberiya zaroktiyê

Wênayê di kefa destê min de qermîçiyê û zaroktiya min di hundirê xwe de hewandiye, li min dinêre niha. Ew zarokê rûgeş li ser sirgûniya min hêstiran dibarîne û li ser ciwanîya min a demekê di xeyalên wî de şîr hatibû... *Berfê / R.12*

## Dema dîrok wan vebêje

Dema ku mirov şert û mercên rojhilatê Kurdistanê, bigire ber çav; di civaka kurd de her tim jinên zana, bîrewer, cengawer, pêşeng û rêber derketine pêş. Ger dîrok heqîqeta jinê, rastiya ku ew pê rabûye vebêje û hebûna ku xwe li ser van nirxan avakiriye bi rûpoşê nepêçe, ev rastî di nav rûpelên dîrokê de neyên nixumandin, em ê bibînin ku gelek jinên kurd dîroka xwe, xwe bixwe nivîsandine, hebûne û hene... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*

## Ev berhem ji bo pêşgirtina talana çandî ye

Hunermend Cewad Merwanî têkildarî pirtûka Stranên Arşîva Radyoya Erîvanê pirsên rojnameya me bersivand û diyar kir ku ev berhem ji bo pêşgirtina talana çandî ye û wiha got: "Dema behsa Radyoya Erîvanê dibe, behsa dîroka stranên kurdî dibe, behsa erdnîgariya Kurdistanê dibe, ji nebatan bigire behsa hemû tiştan dibe..." *Hevpeyvîna Zeynel Bulut / R.4*



# Heke jin hewl bide...

Helen Keller a ji ber hewldana xwe ya jiyane wek abîdeya têkoşînê dihat dîtin, tevî nebûna qebîliyeta xwe ya dîtin, bihistin û axaftinê bi saya mamosteya xwe jiyaneke asayî jiya

Navenda Nûçeyan

Li cihanê gelek mirovên wisa hene ku bêyî biaxivîn, bibihîzin û bibînin bi têkoşîn û hewldanên xwe ji mirovan re dibin îlham.

Yek ji wan kesan jî pedagoga amerîkî jina bi navê Hellen Keller e. Tiştê ku Keller ji pedagogên din cuda dikir korbûn, nebihîstin û lalbûna wê bû. Kellera di 27'ê hezîrana 1880'an de tê dinê, hêj nozdeh mehî bûye di encama nexweşiyekê de qebîliyeta xwe ya dîtin, axaftin û bihistinê winda dike. Tabî ev encama nexweşiyê dibe sedem ku Keller ji derdora xwe dûr bikeve û

bibe mehkûmê jiyaneke tarî. Lê jiyana Keller di heft saliya wê de bi mamosteya bi navê Anne Mansfield Sullivan re diguhere. Mamoste Sullivan bi sebr û hezkirina xwe ya bêhempa ji jiyana tarî ya Keller re dibe rêber.

## Peyva yekem

Yekemîn peyva Heller fêr dibe peyva 'av'ê ye. Mamosteya wê Anne Sullivan rojekê Keller dibe ser pompeyê avê, destê wê dirêjî avê dike û piştê jî peyva 'av'ê li ser destê wê dinivise. Piştî fêrbûna peyva avê di nav saetekê de Keller fêrî 30 peyvên nû dibe.

## Dersên axaftinê

Hellen Keller di sala 1890'an de dest bi dersên axaftinê dike lê tevî hemû hewldanan û ceribandînan teknîkên cuda ji Keller tenê fêrî derxistina çend dangan dibe. Û wan dangan jî tenê hin kesên derdorên jê fêrî dikirin.

Bi saya hewldanên mamoste



Anne Sullivan, Keller wek hevalên xwe yê din perwerdeya xwe berde-wam dike. Hellen piştî dibistana

koran a Massachusettsê û dibistana keran a li New Yorkê di sala 1896'an de ji bo berde-wamkirina perwerdeya xwe bi mamosteya xwe re diçe dibistana Cambridge School for Young Ladiesê. Her wiha Keller zanîngehê jî li Radcliffe College ya di roja me ya îro de girêdayî Zanîngeha Harvardê ye, dixwîne. Di hemû jiyana perwerdeya Keller de Anne Sullivan li gel wê bû û bi piştgiyariya xwe hêzeke mezin dide Keller. Keller a di sala 1904'an de ji zanîngehê mezûn dibe, bi dereceyekê serkeftî dibe yekem kesê kuunvana kesê kor-ker digire. Piştî qedandina zanîngehê jî Keller ji gelek zanîngehan dereceya doktoraya rûmetê digire.

## Pirtûka Çiroka Jiyana Min

Pirtûka Keller a behsa jiyana xwe dike û di dema zanîngehê de nivîsandibû, di sala 1903'yan de tê çapkirin. Pirtûka Keller a bi navê

'Çiroka Jiyana Min' ku di destpêkê de rastî eleqeyê mezin nehat, di nav demê de dikeve nav pirtûkên klasîk. Her wiha pirtûka Keller a 'Çiroka Jiyana Min' bi 50 zimanî tê wergerandin.

Jiyana Keller dema hê ew dijiya, dibe mijara filman û belgefilman. Gelek derhêner û hunermend ji jiyana wê sût werdigirin.

Helen Keller a ji ber hewldana xwe ya jiyane wek abîdeya serkeftin û têkoşînê dihat dîtin, tevî nebûna qebîliyeta dîtin, bihistin û axaftinê bi saya mamosteya xwe wekî hevalê xwe yê din jiyana xwe berde-wam kir. Ew ji wek mamosteya xwe heta dawiya emrê xwe ji zarokên wekî xwe re dibe ronahî û bi têkoşîna xwe nahêle zarokên wek wê di tarîtiyê de winda bibin.

## Canê xwe ji dest dide

Pedagoga amerîkî Hellen Keller a jiyana wê ya tarî bi mamoste Anne Sullivan re tê guhertin û piştê bi têkoşîna xwe ji gelek jinan re dibe mînak, di 1'ê hezîrana 1968'an de bi qeyrana dil canê xwe ji dest dide.



Di dem û çaxên cuda yê dîroka kurd de, li ser vî erdnîgariya dewlemend ku hafizyek mezin a civakî, çandî û siyasî pêk tîne, jinên kurd bi awayekî karîne rê ji xwe re nişan bikin û bandora xwe li vî çand û hafizeya dewlemend, baweriyên heylî bikin. Bi qasî ku karîne di qadên din de xwedî gotin bin, di qadên din, medrese û baweriyên de jî kêr nemane, belkî li gor çaxa ku tê de bûne bandorek wan a erênî ji zêde bûye.

Dema ku mirov şert û mercên rojhilatê Kurdistanê, rewşa civaka kurd ji hêla civakî û çandî, bi vî re girêdayî rewşên taybet ku her tim di nav de bûn bigire ber çav; çî jiyana wan a gundewarî û bajarî be, di civaka kurd de her tim jinên zana, bîrewer, cengawer, pêşeng û rêber derketine pêş. Jixwe gelek caran, ger bend û kelem hebûbin jî, vî rewşê nekariyê rê li ber heqîqet û hebûna wê bigire û jinên kurd bi awayekî karîne heqîqeta ku hebûna wan pêk tîne bidin vegotin. Li gor çaxên jiyane rol û bandorek wan a berbiçav hebûye. Ji bo wê ye ku bi sedesalan jî bi ser de derbas bûbe, ger li ser rastiya wê hatibe nixumandin jî, wê dîsa kariyê vî rûpûşê bide alî...

Ji bo wê, girîng e mirov qala jina bi navê Hefse Kurdiye bike ku di qurna duyemîn hecra de jiyaye. Ew heya nivê qurna sedesala duyem jiyaye. Û ji ber gotinên xwe wê bê nasîn, her wiha wê piştê xwe bide berjewendiyên dinyewî, bi vî rengî jî digihe "dilekî pak" û hebûneke ku wê dîpa. Ew di rêya baweriyê xwe de diji û jiyana xwe di vî oxirê de dibexşîne. Jixwe di mijara softî û din de bi nav û deng bû.

Fatime Xanima Goranî (873-794): Ev jina kurd jî di qurna 9'emîn a hicra de jiyaye. Wek Fatime bin Bedir bin El-Cemal Goranî jî dihat nasîn. Ew jineke zanyar a kurd, mamoste bû, hedîs dixwend.



Zehra Mohammedzadeh

## Dema dîrok wan vebibêje...

Pergala ku hebûna jinan jî nedîtî ve dihat, carnan jî navên wan jinan li rex navê bav û birayên wan rêz dikirin; li şûna ser berhem û xebatên wan raweste, bi awayekî diket nav hewldana serpeçana vî rastiyê. Lê dîsa jî nekarîne bandora wan a li ser civakê jî nedîtî bîn, kêr û nebes be jî, behsa wan nekin. Lê belê pênivîsa bi sihr a jinê û hewldana derxistina rastiya wê ya dîrokî -bi agahî û zanyariyên pir kêr- kariyê bi awayekî rê li ber jî nû ve destgirtina vî heqîqetê veke.

Ji bo wê, girîng e mirov behsa Ayşe Tûrcanî bike ku di sedesala 14'an a hicra de jiyaye. Ew jineke zanyar û mistîk a kurd bûye, heya nîveka pêşîn a sedesala 14'an jiyaye. Wê hebûna bavê xwe û derfetên heylî bi awayekî herî baş bi kariyê û jî hemû zanistên hevbeş ên wê demê sût werdigirtiye.

Li gor hin agahiyan ew jî gundê Qizilcî yê bi ser Pencwinê tê dinyayê û jî bo ilm û agahiyê tê rojhilatê Kurdistanê. Lê guman heye ku jî rojhilatê Kurdistanê, Banê be jî. Ji ber ku li wir jiyaye.

Helbet a girîng bandora wê demê daye avakirin û rola wê ye... Ayşe Tûrcanî wê destûra perwerdeyê bigirta û jî wir û şûn de jî, heya dawiya jiyana xwe, xwe li ber perwerde û pêşxistina neslê ciwanê jî malbata xwe bida. Ew jineke bixîret bû. Ji ber bi kêrî xwe dihat, xwedî hiş û ferasetek dewlemend, bireke bi hêz û zanyariyê mezin bû, pir kêr kesan kariyê bi wê re

bikevin nav nîqaşên zanistî û dinî. Heta birayên wê, Mela Hesen û Mela Hisên Qizilcî ku her du jî zanyar û mamosteyên hêja yê dema xwe bûne, Ayşe di mijara feraset û jêhatîbûnê de bi ser xwe de dizanin.

Wek em di van mînakên de jî dibînin jinên kurd di qadên mistîk û dinî de jî, di nav civakê de bi bandor û kêrhatî bûne. Tu caran kêr nemane, belkî ziman û şeweya xwe pênasekirina di nav civakê de her tim bi awayekî dîtine, pêk anîne.

Helbet girîng e li vir mirov behsa Fexrolnesa Şehde Dînewerî bike: Fexrolnesa Şehde Dînewerî di qurna 11'an a Mîladî de, li bajarê Dînewera rojhilatê Kurdistanê tê dinyayê. Babê wê Ebûneser Ehmed Bin Elfecr el-Dînewerî ye, eleqeyek wî mezin a ji ilm û hedîsan re hebû û li ber destê gelek mamosteyan perwerde dibîne. Ew li gor kevneşopiyê li ser perwerdeya keça xwe radiweste û wê perwerde dike. Ji bo wê jî keça xwe danî ber destê hin mamosteyên bi nav û deng da ku di zanistê de bi pêş bikeve. Fexrolnesa wê li Bexdayê û di bin çavdêriya hin mamosteyên wek Teryad bin Mohemmed Elzeybînî, Ebn Telhê Elnelî, Ehmed bin Ebdulqadir bin Yûsif û hwd. deperwerdeya hedîsan bidîta. Li gel hedîsan jî vî fêrî şaxên din ên agahî û zanistên wê demê bîba.

Wê demê jinan nedikarî li derve perwerde bidîta, ji bo wê jî hejmarek kêr a jinan be jî di mal de, an jî derveyê sînoren malbatê û di ber destê

mamoste û aliman dikarin di hin qadên cuda de perwerde bibînin û xwe bi pêş bixînin. Ew ê Fexrolnesa Dînewerî jî di zanista hedîsan de perwerdeyek baş bidîta.

Gelek kesên ku jî bo dersxwendinê jî cihên dûr dihatin, dema jî bo pola wê dihatin pejiirandin, ew wek nişaneyê şanaziyê dihat pejiirandin. Hejmarek zanyarên bi nav û deng ku destûra vegotina hedîsan jî wê werdigirtin, hebûn.

Fexrolnesa Dînewerî li gel hedîsan, di mijarên wek dîrok, zimanzanî û wêjeyê de jî xwedî agahî bû û di van mijaran de diaxivî. Ew jî hêla hunera xweşnivîsiyê de jî jêhatî û yek ji mamosteyên wê hunerê bû. Jixwe ji ber vî jêhatîbûna xwe, wê bi navê Fexrolnesa (şanaziya jinan) gazî bikirana. Ew ê li kêleka çemê Dicleyê ciheke mezin a perwerdeyê ava bike û wê derê veguherîne qadek kombûna xwendekaran ku bikaribin dersên wê bişopînin; jixwe hemû mesrefên wê derê jî aliyê wê ve dihatin dayîn.

Nayê zanîn ka Fexrolnesa Dînewerî di çî salê de çûye Bexdayê, lê li gor agahiyên heylî ew jî bo zanyarî û perwerdeya di qadên cuda de diçe wir... Ew di sala 1112'yan de, di 90 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide. Mera-sima cenaze li zanîngeha Elqesr a Bexdadê tê lidarxistin û bi hezaran kes, her wiha gel û zanyar, xwendekar û rayedarên dewletê beşdar dibin.

Ger dîrok heqîqeta jinê, rastiya ku ew pê rabûye vebêje û hebûna ku xwe li ser van nixan ava kiriye bi rûpoşê nepêçe, ev rastî di nav rûpelên dîrokê de neyên nixumandin, em ê bibînin ku gelek jinên kurd ku dîroka xwe, xwe bi xwe nivîsandine, hebûne û hene.

# Rabirdûya balîfekî û afirîneriya ji bêderfetiye

Hin caran bêderfetiye tiştên baş bi mirov didin kirin. Mî-naka vê yekê li mala me derket holê. Beriya bi salan ji bêderfetiye dayika min ji kincan balîfekî çêdike û dîroka çend salan tê de dihewe

Qedrî Esen

Balîf amûreke wisa ye ku di jiyana mirov de cihekî gelek girîng digire. Bi qasî kincên li ser mirov nebin jî balîf jî şahidiya beşeke mezin a jiyana mirov dikin. Bi roj weke sîtûnekê ji mirov re dibin piştê û bi şev jî dibin barhilgirê giraniya ser, xewn û xeyalên mirov. Mîna kamera û wênegirê jiyana mirov resm û qeyd dikin û bi qasî dengirêkê jî guhdariya fikir û xeyalên mirov dikin. Lê ji ber ku zimanê wan tune nêzikarî tiştên dibînin û dibîzin bînin ziman.

Lê hin balîf hene ji ber şert û mercên dema çêkirina xwe rabirdûyeke wan a xurt heye. Yek ji van balîfan balîfekî li mala me ya gundê Fêra ye navçeya Farqîn a Amedê ye. Ev balîf di salên 1990'î de bi destê dayika min Aliya Esen hatiye çêkirin. Havînan li eywana mala me ya di navbera 4 odeyan de dirêj dibe, tê danîn. Zivistanan jî li "odeya biçûk" ku di nav malbatê de ji ber biçûkbûna wê ev nav lê hatiye kirin, tê danîn.

## Têrnekirin bûye sedem

Hêta beriya çend mehan ji agahiya min ji balîfekî me yê wiha tunebû. Rojêkê dema ez çûm malê, bi wesîleya paqijiyaya malê, dayika min ji min re qala vî balîf kir. Got ku di salên destpêkê yê 1990'î de wê ew çêkiriye. Li ser pirsên min ên derbarê mijarê de piştê çû wan rojan. Destnîşan kir ku roja ku

balîf ji mala me re çêkirine, hiriya wê tîr nekiriye û bi kel û pelên kevn ên li malê balîfekî çêkiriye û bi salan e bi kar tînin.

Piştî ku min ev hîn kir, ji dayika xwe xwest ku bêyî min vî balîf xera neke. Lewre rabirdûya çend salan di vî balîf de veşartî ye. Destpêka meha heziranê rojek ku ez ne mal bûm, li gel hemû astengiyên dayika min jî xwişkeke min ji ber meraqa xwe ya zêde tîne balîfê ez gelek nix didimê xera dike. Lê tenê bi xerakirinê dimînin û nav wî ji ber hişyariya min navêjin. Berê êvarê dema ku ez çûm malê dayika min agahiya xerakirina balîf da min.

## Her perçeyî vedibêje

Bi vî agahiyê re ez gelek aciz bûm û min got, "Min ji we re negotibû bêyî min xera nekin û ji hev nexînin. We çima xera kir?" Dayika min û xwişka min li ber dilê min dan û xwestin ku ez xwe aciz nekim. Ji bo ku hinek acizîya min dakeve gotin ku nav balîf navêtine û ji bo dîtina min hilandine. Li ser vî agahiyê hinek bêhna min hat ber min. Piştê em çûn binî sefa mala me û yeko

yeko li kincên bi salan ên di nav balîf de nêrî.

Dayika min her carê radike parçeyekî kinc û çiroka wî ji min re vedibêje. Bi hurgilî qala her parçeyî dike û kincên kê bin diyar dike. Her wiha çiroka kirin û kevnûna wan jî ji min re vedibêje. Ne tenê kincên kirinê, kincên ku wê bixwe bi destên xwe çêkirine jî di nav balîf de hene. Yek ji van kincan gelek bala min kişand. Ev kinc jî pîjameyekê zarokan e. Dayika min bi destê xwe vî pîjamayî çêkiriye.

## Kincên di balîf de

Ku ez dibêjin wê çêkiriye, şaş fêm nekin makîna dirûtinê ya dayika min tunebûye. Hemû kincên ku wê çêkirine û di nav balîf de cih digirin, bi derziya destan çêkirine. Belê ez qala wî pîjamayê ku bala min kişandî bikim. Devzendîkên pîjama bi devê goreyekê hatiye çêkirin. Li gorî agahiya dayika min da; perçeyê pîjama jî rûyê doşeka me ya kevn e. Ji ber tunebûnê, dayika min rûyê doşeka ku kevn bûye neavêtiye û pê pîjameyek çêkiriye.

Gelek kincên din jî di nav balîf

de hene, hinek jî qala wan bikim. Bestika xwendekariyê ya kekê me yê mezin heye ku zêdetirî 20 sal in piyê wî bi malê neketiye. Ev bestik, me gelek xemgîn û ewqas jî kêfxweş kir. Dîsa çend boxçikên bûkaniyê yê dayika min, qazax, êlek, pantor, pijama, etek, çitîk, fistan, şalwarên jinan ên bi şev û roj bi wan kar hatiye kirin. Li gorî vegotînan dayika min; perçeyên fistanên wê yê ciwaniyê yê beriya bîzewice jî di nav balîf de ne. Ev parçe hatine qetandin û ji bo ku bibine ben li teşiyê hatine xistin.

## Dîroka 50 salî

Bi kurt û kurmancî, heke em parçeyên fistanên wê yê ciwaniyê esas bigirin, dayika min ji bêderfetiye, dîrokeke nêzî 50 salî di vî balîfê me de hewandîye. Balîfê me yê bi pirtikên mirîşkan hatine çêkirin jî hebûne, lê ji ber ku ji zû ve wan wîndî kirine min ew nedîtine. Di vir de ji bilî dîroka di balîf de hilberîneriya jinê ya ji bêderfetiyan derfet diafirîne jî heye. Ji gelek kincên ku hatine ber avêtinê, bi destê jinekê amûreke ku bi salan hatiye bikaranîn hatiye çêkirin.



# Êrîş bû sedema krîza dîplomatîk

Navenda Nûçeyan

Dewletê careke din serî li rêya ku gelek caran serî lê daye, da û piştî 12 salan bi hêzeke mezin li dijî başûrê Kurdistanê êrîşeke leşkerî pêk anî. Herî dawî dewletê di sala 2008'an de serî li vî rêyê dabû û piştî êrîşên 8 rojan vekîşiyabû. Li ser vî vekîşandinê di siyaseta Tirkiyeyê de gelek nîqaş hatibûn kirin. Hat angaştîkirin ku ji bo

qelskirina artêşê bi zanebûn ev operasyon hatiye destpêkirin û bi dawîkirin.

Piştî vî vekîşandinê heta bida-wîbûna Pêvajoya Çareseriyaya Demokratîk êrîşên mezin li dijî başûrê Kurdistanê nehatin kirin. Lê piştî ku pêvajoya bi dawî bû û heta niha gelek êrîşên hewayî yê bi sînor hatin lidarxistin. Di demê ku helwanên pêkhatina yekitiya kurdan zêde bûne de dewletê careke din operasyonên

derveyî sînor kir rojeva xwe û ji bo vî yekê dest bi amadekariyan kir.

## Sivîlan canê xwe ji dest da

Di vî çarçoveyê de, di 11'ê heziranê de dewletê bi dehan balafirên şer anî balafiregeha leşkerî ya Amedê. Piştê jî Nexweşaneyaya Dewletê ya Silopyayê ji bo vî operasyonê hat amadekirin. Piştî van amadekariyan şeva 14'ê heziranê bi tevlibûna bi dehan balafirên şer, li dijî Wargeha Mexmûr, Şengal û Qendilê êrîşên hewayî pêk hatin. Di 16'ê heziranê de bi helikopteran hejmarek leşker jî derbasî herêma Heftanînê hatin kirin.

Di van erîşan de gelek gundên ava ku bi sedan sivîl têde dijîn hedef hatin girtin. Di encama erîşên hewayî de li van gundan 4 welatiyên başûrê Kurdistanê canê xwe ji dest da û xesareke mezin gihîşt û mal û baxçeyên gundiyan. Li Silêmaniyê gel daket qadan û bertek nîşanî erîşan da. Her wiha ji hikûmeta navendî ya Iraqê û Herêma Kurdistanê xwest ku pêşî li erîşan bigirin. Ji bilî başûr li bakurê Kurdistanê jî erîş bi bertek hatin pêşwazîkirin.

## Welatên ereb hişyar kirin

Dîsa di nav hefteyê de erîş di navbera Tirkiyê û welatên herêmê de bû sedema qrîza dîplomatîk. Di serî de Iraq çend welatên ereb bertek nîşanî erîşan da. Wezareta Karên Derve ya Iraqê, ji ber erîşê 2 caran sefirê Tirkiyeyê yê Iraqê vexwend wezarete û ew hişyar kir. Wezarete xwest ku Tirkiyê serweriya wan bin pê neke û hemû hêzên xwe yê leşkerî ji Iraqê vekîşîne û careke din li dijî Herêma Kurdistanê erîşan pêk neyne.

Wezarete karên derve yê Erebiyê Siûdî, Îmaretê Erebî û Bayreynê têkildarî erîşê daxuyandî dan û erîş şermezar kir. Her sê welatan jî destnîşan kir ku erîş li hemberî serweriya Iraqê ye û ew qebûl nakin ku li dijî serweriya Iraqê erîş pêk bên. Dîsa ragihandin ku heke Iraq ji wan alîkariya bixwaze ew dikarin piştigiriyê bidin Iraqê.

Tevî bertekên kurdan û welatên ereb jî erîş nehatin rawestandî. Dibe ku berdewamiya erîşan di navbera welatan de bibe sedema krîzeke mezintir.

Xweşkanî



Felemez Ulug

## Aliyê tirk pêvajoyê dixitimîne

Pêwîst bû ku hefteya borî Wezîrê Karê Derve Sergey Lavrov û Wezîrê Parastinê Sergey Şoygû yê Rûsyayê ji bo bi erkdarên tirk re rûnên serdana Tirkiyeyê bikirana. Ev serdana ku di deqeya dawiyê de hat betalkirin di serê gelek kesan de pirsnişan ava kir. Li ser vî mijarê pirsên ji şewirmendê serokdewletê Rûsya Vlademîr Pûtîn Dimîtrî Peskov re di civîna çapemeniyê de hatin kirin bê bersiv man. Bêguman bêbersivmayîna van pirsan ji milekî ve asta krîza di navbera Enqere û Moskovê de dide nîşandan.

Tê gotin ku şandeya rûs di balafirê de agahiya betalkirina girtine. Ev jî nîşan dide ku Rûsya û Tirkiyê di hin mijarên girîngê herêmê de ne hemfikirin.

Diyar e ku ev hevdiîna rojeva wê pevçûnên li Libya û Idlibê her roj diwratir dibin ji bo rêya çareseriyê tîr nehatiye dîtin. Ango aliyekî nexwestiyê di vî pêvajoyê de destê xwe lewaz bike, yan jî nexwestiyê pêşî li pevçûnên dijwar dibin bigire û rêya çareseriyê bi pêş bixe. Ji ber aliyê nexwestiyê hevdiîtan pêk bê aliyê tirk e, aliyê naxwaze li herêmê çareserî û îstîklar bi pêş bikeve ji aliyê tirk e.

Di navbera aliyên tirk û aliyên rûs de ev demek dirêj e ji bo vî hevdiîtanê amadekarî dihatin kirin. Li ser gelek mijaran jî li hev hatibûn. Tê zanîn ku di 10'ê heziranê de ji bo vî hevdiîtanê Pûtîn û Erdogan bi rêya telefonê axivîbûn û ji bo hevdiîtanê pêk neyê tu astengî nebûn.

Di vî hevdiîtanê de de pêwîst bû ku li Libyayê agirbest bihata ragihandin. Ev agirbesta ku demek dirêj e li ser nîqaşên kirin ji ber aliyê tirk naxwaze pevçûn rawestînin her tîm nagihêje encameke erênî. Di vî mijarê de ji bo agirbestek bingehîn bê ragihandin biryarên Konferansa Berlînê ya di 19'ê çileyê de hatibû li darxistinê jî wek tê xwestin neketin meyretê. Dewleta tirk çawa ku li tu deveran naxwaze agirbest hebe naxwaze li Libyayê jî agirbestek bingehîn bê îmzekirin. Ji ber dewleta tirk êdî ji ranta şer sûd werdigire ev şer bi kêrî wê tê.

Di mijara agirbestê de di 2'yê heziranê de Hefter ragihand ku ew ji bo agirbestê bê ragihandin destûr didin ku komîteya leşkerî yê mavnatewîyê xebatê bidin meşandin. Der barê vî mijarê de 9'ê heziranê de ji aliyê hêzên Sarraç ve jî hat ragihandin ku ew jî ji bo hevdiîtanê bên kirin destûr didin. Yanî agahiya dewleta tirk jî despêkê ve ji her gav û civînên li ser agirbestê tîr pêk tîr heye. Lê derdê dewleta tirk ne agirbest e.

Moskov jî pêşveçûnên heya zêde ne-rehet e. Bi taybetî piştî ewqas amadekarî û xebatên betalkirina hevdiîtanê wezîran di aliyê rûs de aciziyek mezin daye avakirin. Rûsya piştî Idlibê vî carê li Libyayê jî ji hêla tirkan ve hatin xapandin. Lewma her çiqas niha di vî mijarê de ji Kremlînê deng derneketibe jî ev nayê wateya qebûlkirina vî mijarê.

Mijara Libyayê mijareke pir girîng e û ger di demek nêz de çareseriyek jê re neyê dîtin wê ev mijar veguhere girêka kor. Wê carê derfetên heya jî wê ji dest biçin. Niha li pêşiya çareseriyê fitne û entriqayên Osmaniyan hene. Bawer dikim ku di vî mijarê de aliyê di xitimandina pêvajoyê de israr dike wê bibe aliyê tîkçûyî.



## EV BERHEM JI BO PÊŞÎGIRTINA LI TALANA ÇANDA ME YE

## Dîrok di stranan de veşarî ye

→ Zeynel Bulut

Bi kedeke mezin a ji bo berhevkirina stranên kurdî, bi giştî derdora 4 hezar û pêncsed kaset hatine berhevkirin, di van de derdora 40 hezar stran hene. Di nav van stranan de dibe ku bi qasî 10 hezar stranên dubarekirî hebin, dîsa jî bi qasî 35 hezar stran û kaset di destê me de ne

## Cewad Merwanî kî ye?



Di sala 1964'an de li gundê Boşatê yê Farqîna Amedê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî û navendî li Farqînê, demeke kurt jî li Fakulteya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Dicleyê xwendiyê. Piştî salên 90'î ji ber zextên dewletê derbasî Sûriyeyê û piştre ji wir jî derbasî Ewropayê bûye. Bi salan e arşîva stranên kurdî amade dibe û heta niha jî ve arşîvê 3 berhem tevî stran, notasyon û şîroveyan çap kirine.

*Mêvanê me yê ve hejmarê hunermendekî kurd e ku zêdetirî 30 sal in bi karê muzîka kurdî re mijûl dibe. Ew di salên 75-76'an de bi Koma Azadî hat naskirin. Her wiha li Ewropayê di bin sîwana Akademiya Çand û Hunera Kurdî de xebatên xwe kirin û wekî gelek hunermendan wî jî ji biçûkiya xwe ve dest bi vî karî kiriye. Me der barê jiyan û hunera hunermend Cewad Merwanî de ev hevpeyvîn ji we hêjayan re amade kir.*

**Ji ber eleqe û xwedîderketina li muzîka kurdî tu hatî girtin, rastî êrîş û ceza hatî û ji neçarî çûyî derveyî welêt. Ev pêvajoya çawa qewimî?**

Hêj beriya 12'ê Îlonê min ji bo xwe kasetên dengbêjan ên wekî; Tahsîn Taha, Hesenê Cizîrî, M. Arîfê Cizrawî, Meryem Xan, Kawis Axa û her wekî din ji şofêrên diçûn Iraqê dixwestin, wan jî ji min re dianîn. Hê wê demê bi hezaran kaset min kom kiribûn. Li Farqînê qehweyê biçûk hebû, me lêdixist. Roja 12'ê Îlonê bi ser qehweya me de girtin, ev kasetên min tev avêtin bin tekerên cemsên leşkeran û hemû hûr kirin. Li kolana li ber qehweyê min avêtin erdê û heta tu bêjî bes li min xistin û îşkenceyê giran li min kirin. Lê ew roj min nebirin, nizanîm tiştêk çêbû, min di cih de hiştin û çûn. Piştî ez rabûm min ew kaset tev kom kirin û birin li cihekî kes nebûne û di heman demê de ez çûm min kasetên tirkî jî standin nav wan vala kir û yê kurdî tê de bi cih kirin. Piştre min ew qedand û li cihekî xist binê erdê, veşart.

Careke din min ji xwe re cihazekî mezintir kirî û ez çûm dawetan. Kesî newêribû stranên kurdî bistrê, lewre tirs hebû, heps hebû. Wê demê grûbêke Salih Dalgîn hebû, wî mamostefî dikir lê dev jê berda. Hozan Şiyar jî hatibû girtin di hepsê de bû. Wekî din jî kes tune bû li wê derê stranan bêje. Jixwe di 12'ê Îlonê de gotina stranên kurdî gelekî zehmet bû. Heta sala 90'î ev wiha bi îşkence, lêdan derbas bû. Rewşêke wisa pêş ket ku di salên 92'yan de ne ku em stranan bêjin, êdî em nikaribûn derbikevin kolanan. Di sala 92'yan de ez derbasî Sûriyeyê bûm û piştre jî derbasî Ewropayê bûm.

**Di xebata we ya Stranên Rîtmîk ên Radyoya Erîvanê ku di sala 2016'an de Weşanên Aramê ew çap kir û xebata Stranên Arşîva Radyoya Erîvanê de em dibînin ji aliyê heman komê ve hatiye amadekirin. Her du xebat jî di warê naverokê de gelekî nêzî hev in. Cudahî û sedema vê yekê çî ye?**

Stranên ji aliyê Weşanên Aramê ve hatine çapkirin stranên rîtmîk in. Me xwest îcar em stranên ne tenê rîtmîk yê mawal jî bi hev re çêbikin. Werhasil ez jî nizanîm çima me ji hev veqetand. Lê ew şaşiyek bû. Ez wisa kêmasiyekê dibînim. Ev stranên rîtmîk û mawal, em bêjin me ji yeke mawal re piştre gotiye rîtmîk. Lazim bû me bi hev re çêbikira lê ji hev hat veqetandin. Bi rastî bê dilê min jî bû. Wê demê me stranên rîtmîk cuda çêkirin. Lê belê niha ev di vê xebatê de bûn yek.

**Ev berhema ji 4 cildan pêk tê; 2 jê yê stranên rîtmîk in û 2 jê jî wekî yê**



**serbest we bi nav kirine. Bi giştî nêzî 3.200 rûpel e, ji nêzî stranên 200 stranbêj û hunermendan pêk tên û nêzî 900 stran in. Gelo bi giştî arşîva Radyoya Erîvanê ev e yan we ji wan hin stran hilbijartine?**

Yanî niha stranên Radyoya Erîvanê li gorî ku ji min re hatiye gotin ev in. Wexta li wê derê jî me tomar kirin, wan jî got ev in ji xeynî wan tune ne. Lê li gel stranan mijarên wekî kompozîsyon, çîrok û listikên şanoyê jî hebûn. Me ev jî stranan cuda kirin. Me got bila ew hinekî bimînin. Me wan jî da akademiya çand û hunera kurdî û me xwest li wir jî bê parastin.

**Xuyaye bi salan e we stranên kurdî berhev kirine. Ji bo vê xebatê ked û baweriyê xurt pêwîst e. Di heman demê de parastina van stranan û vê arşîvê jî zehmet e. We heta niha çiqas stran berhev kirine û hûn wan çawa diparêzin?**

Stran çî ye, ferqa xwe çî ye? Ji her miletî re hurmeta me heye. Muzîka her miletî heye. Ya me kurdan jî heye û pir e. Bi saya vê şoreşê, keda serokatî, keda şehîdan, bi ked û armanca lehengên me û şoreşê derfetên me çêbûn, em xebateke wiha bikin. Vê kedê derfet da ku ez bikaribim biçim Ermenistan, Xorasan, Îran, Başûr, Bakur, biçim Mîsrê, Rûsyayê û hwd. xebatê bikim û arşîvek wiha amade bikim. Ya din ev jî kêma dima ji mecbûrî min ji vana hinek li ba xwe, hinek di depoyan da muhazeze kirin ku winda nebin. Werhasil gelek hevalên me jî keda wan heye lê zêdetir min wekî berpirsiyarê vî tiştî dîtin. Bi giştî niha texmînî dibêjim bi qasî 4 hezar û pêncsed kaset hene. Ji 4 hezar û pêncsed kasetê ger tu bifikirî her kasetek 10 stran tê de be dike 40 hezar stran. Her kasetek 12 stran tê de hebin, dike 42 hezar stran. Di nav vana de Merdan çûbû Sûriyeyê hinek kaset bi xwe re anibûn, Zarîfê û Şemdîn hinek bi xwe re anibûn dîsa hinek li cem hunermendên me yê din hebûn. Ez çûm Enstîtuuya Kurdî ya Parîsê min

hinek kopî kirin anîn. Her wiha jî vir bigire heta Kazakistan, Kanada, Îranê, kurdên me yê li Konyayê, yê li Mersê û yê li deverên din çî hebûn li ba wan me kom kirin û kirin arşîva gelê kurd. Dîsa di sala 2001'î de ez çûm Bexdayê li wir arşîva Radyoya Bexdayê ku di destê dostekî me yê asûrî de bû, me ew jî kom kirin anîn tev li vê arşîvê kirin. Çend sal berê Seydayê Goyan ê Hekarî û Hilmî Akyol hinek ji min re şandibûn. Ez silav û rêzên xwe ji wan re dişînim. Wê demê Weşanên Avestayê pirtûka bi 1024 stranî çap kir. Ji wê qebatê derdora 300 stran ên soranî bûn, 270 stran jî yê herêma Amedê bûn. Me ev arşîv jî kir pirtûk lê me wê demê nedikarî em CD'ya wê xebatê derbixin, tenê stran û notasyona wan me kir û bi navê Kilam û Stranên Kurdî me kir pirtûk. Bêguman kêmasiyên vê xebatê jî hene lê pêşerojê dibe ku em bikaribin sererast bikin.

Wisa texmîn dikim ku niha ji 42 hezarî ne kêmtir in stranên me û ew di hardîskê de ne. Yanî ev stran hemû jî yê gelê kurd in. Ev stran dibe ku pîranî na lê bi qasî 10 hezar dubare bin jî dîsa 30 hezar stran hene. Yanî halê hazir bi qasî 35 hezar stranên me û kaset di destê me de ne.

**Tu rist û mîsyona Radyoya Erîvanê ya ji bo dengbêjî û muzîka kurdî çawa dinîrxîni?**

Bandora Radyoya Erîvanê ne tenê li ser hunermendekî/ê li ser her kesî çêbûye. Dema behsa Radyoya Erîvanê dibe, behsa kedê dibe, behsa dîroka stranên kurdî dibe, behsa erdnîgariya Kurdistanê dibe, ji nebatan bigire behsa hemû tiştan dibe. Behsa qetlîamên li ser gelê kurd, gelê êzîdî bûye, behsa komkujiyên li Kurdistanê hetine kirin dibe. Kurdên me yê koçber bûne, ce-wherê xwe jî bi xwe re birine û li cihên koçber bûne bi hestên xwe stranên xwe derxistine pêş. Tiştêkî wiha li dinyayê tune ye. Dema stranek li Radyoya Erîvanê lêdikeve tu dizanî wî/ê kesî/ê, wê

malbatê yan jî vî gelfî çî cefa kişandine. Lê belê niha em dikin nakin di stranên me yê niha de tiştêkî wiha nabînin. Lewre hest bi me re nemaye. Bi dehan caran min dîtiye ku diya min, bavê min malbata min li ber vê radyoyê digiriyan. Ew tev hest bûn, tev huner bûn, tev dîrok bûn. Yanî ne mimkun bû ku kurdek ev radyo guhdar bikira û tesîr lê nekirana.

**Tu rewşa heyî ya huner û muzîka kurdî û girîngiya vê berhemê ji bo gelê kurd çî ye?**

Ev ji bo min dîrok e, ev ji bo min eşq û ruh e. Em îro di vir de van stranan rizgar bikin wekî ku em şahdamara kurdan vebikin. Hem ji bo hundur û hem jî ji bo derve ev wiha ye. Yanî dijminê me yê bi destê hunermendên bi eslê xwe kurd bûn, bi destê wan van stranan diguherandin û ji xwe re dikirin tirkî û dikirin repertûwar. Heke ez biçûma TRT'ê û biçûma konserwatîwara Îzmîrê dê yek ji wan jî îro ez bûma. Lê evan ên van stranan diguherînin, pê bûne hunermend û ji xwe re difiroşin û rantê bi dest dixin. Yek ev e. Ya din jî qirkirina çandê ye û li hember qirkirina çandî ya em bi xwe ve qirkirinê bi pêş dixin. Yanî em xwe bi xwe vî tiştî dikin. Îro em hatine wê merhelê ku ji celadê xwe re li çepikan dixin.

**Em çawa ji celadê xwe re li çepikan dixin?**

Îro me jî populîzm derxistiyê pêş. Şaş fêhm nekin ha em ji yê xwe re dibêjin. Ez jî yê tirkan re nabêjim. Ji qaşo hunermendên me yê kurd re dibêjim. Em hevalên hev in. Wele tîne ez silavê jî didim wan, qedrê wan jî digirim, çî ji min diqedê dikim, hurmeta kurdîtiyê jî ez dikim lê em ji vana re dibêjin.

Yek ji bo derve pêşigirtina talanê, ya din jî ji bo hundir, yê li nav me ji bo pêşigirtina talana vê çandê ev berhemê hêja ye. Bi derketina vê berhemê ez wisa kêfxweş im ku nikarim bînim ziman. Niha li Ewropayê xaniyê min tune ye, ez di kirê de me, heke xaniyê min hebûya min ê firotiba û li ser vê çandê bida. Ji bo ku min bikaribûna yê din jî zû bi zû xilas bikirana. Ev qas ku tesîra xwe li ser min kiriye.

Yanî menfîeta vî xelkî, çanda wî tune dibe. Yê li derveyî me talan dîke, yê li hundir talan dikin. Me jî vê berhemê derxistiyê, me rêya resen, xweser, xweyî û xwebûniyê nîşanî gelê xwe daye. Gelek nivîskar spasiya me dikin ji ber vê ked û xebatê. Ji bo me jî ya herî bi qîmet ew e ku ev berhem bigihêje gelê me û gelê me jî bixwîne, bibîne û çanda xwe nas bike. Ji vê yekê xweştir ji bo min tiştê tune ye. Karê min jî ev e ku ez vê hunera resen û dewlemend xilas bikim û bi gelê xwe bidim nasîn. Em bûne erebesk, em bûne populîst, em bûne her tişt lê em nebûne xwe. Ev berhem jî ji bo vê yekê girîng e ku em bibin xwe, werin ser xwe û hişê xwe bidin serê xwe. Di dawîya vê hevdîtîne de spasiya xwe ji xebatkarên Xwebûnê re dikim. Xwebûn pîroz be li we, serkeftîne jî we re dixwazim.

*\*Berfirehiya vê hevpeyvînê li ser malpera Xwebûnê ye.*

# Di edebiyatê de alegorî û alegoriya neteweyî

Qobad Înxan

Alegorî peyveke esas yewnanî ye ku ji ser zimanê frensî belavê cîhanê bûye û wateya wê ya ferhengî wekî; bi rêya hêma û sembolan derbirîna fikir, reftar, tevger, hest, çemk û tiştayan hatine pê-nasekirin. Alegoriya edebî jî bi piranî wekî cureyeke vegêranê ye ku tê da kesayet, kirdê, çemk û rûdan gelek caran ne bi awayekî asayî û servekirî ye, belkî tê de kesayet, çemk û gelek rûdanên duyemîn ên vegêranê bi awayekî veşartî tîn şrovekirin. Ji ber vê hindê alegoriya edebî xwedî du astên cihê ye; asta rûxsarî û asta navxweyî.

Maureen Qulligan di berhema xwe ya bi navê The Language of Allegory de bi berfirehî li ser tîgeha alegoriyê radiweste û hewl dide vê tîgehê li ser binyadekê bi cih bike. Qulligan di serî da ferqa di navbera "şroveya alegorîk" û "wêjeya alegorîk" da destnîşan dike. Li gor wî, dema meriv metnekê di çarçoveyê alegorîk da hildide dest, ango meriv şroveyeke alegorîk lê dike, meriv diyar dike ku ew metin hem ji hêla rûxsarî ve hem jî ji hêla navxweyî ve xwedî tebeqeyên wateyan e û ev wate jî bi awayekî stûnî xwe li gor sazkirineke hîyerarşik rêz dikin. Dema meriv tiştêkî wiha dike, ewçax wateya rûxsarî tê bînirxkirin û meriv wê wateya rûxsarî tîne asta hûrgilîyeke ku dê meriv bibe ser wê wateya esasî ya di binyadê da veşartî. Di vir da êdî metin ne wekî diyardeyeke ku wateyê eşkere dike, lê wekî diyardeya wateyê vedîşere û vedidize derdikeve holê. Bêguman, di vir da mesafe dikeve navbera wateyan û xwînerê dixwaze metnê veroje û wateyê bi dest bixe dê jî xwendina metnê zewq wernegire.

Her wiha li gorî hin helwestên cihêtir, alegoriya edebî di hûnera şîrê da bêhtir kêşedar e. Li gorî fehma navborî alegoriya edebî piştî demekê rê li ber şayîran digire û nahêle ew bi peyvekê gelek diyardeyan destnîşan bikin. Heke em bi berdewam jî ve bergehê lê binêrin; alegorî jî bo şayîran cureyeke berbestkirî ye. Lewra jî bo şîrê alegorî cureyeke sinordar a nîşandanê ye. Nîşaneyên di cureya alegoriyê da tê emilandin tenê jî bo diyardeyekê ye. Lê şayîr li pey nîşaneyên wisa digerin da ku bikaribin bi nîşaneyekê gelek diyardeyan destnîşan bikin, an jî biniçin gelek diyardeyan.

Di peşanê da û nexasim di romanê da alegorî bêhtir tê emilandin. Sedemên vê bi dirokçeya çesna romanê ve girêdayî ne. Heke em Don Quixote wekî romana ewil bigirin dest û bikêlimin, ew çax em ê bi riheftî bikaribin bibêjin ji Don Quixote vir ve alegoriyê xwe li ser çesna romanê 'edilandîye. Kêş û hewayê şehyanî (karnevalessk) ya di romanê da, alegoriya edebî derxistîye pêş û kirîye ku alegoriya edebî li gorî serdem û li gorî cîhanan (ku Jameson cîhanê bi sê beşan dabêş kiribû: cîhana yekem a kapitalîst, cîhana

duyem a sosyalîst û cîhana sêyem a kolonozikerî) bi hin taybetiyên ciyawaz xwe biperisînin.

Dema meriv alegoriyê wekî cureyeke edebî bibîne û li pey destnîşankirina ferqên di navbera berhema alegorîk û yên mayîn bikeve, ew çax meriv dê bibîne ku wateyên di metnên alegorîk da hene, wekî tebeqe nehatine rêz kirin. Berovajî ve bi rêya peyv û risteyên di van metnan da hatine hilbijartin wate bi awayekî berwarî xwe dide saz kirin û jî ber ku di navbera van wateyan da jî mesafeyê hîyerarşik tune ye, xwendevan bi awayekî hemdemî jî metnê tîdigihêje. Êdî xwendevan jî bo bidestxistina wateya navxweyî, zewq jî xwendina xwe werdigire, nake qurban. Ji lewra di van metnan da wate xwe di kûrahiyan da venaşere, di peyvên metnê bi xwe da berceste ye. Lê belê, divê xwendevan li vir, li bikaranîna wî zimanî baldar be, yê wateyên pirhejmarî lê bar bûye. Sedem jî ev e; di cureya alegorîk da hesasîyeta xwendevan a bo ziman wekî egera herî kartêker derdikeve pêş. Nexwe, meriv dikare bibêje, xala cureya alegorîk jî cureyên mayîn ciyawaz dike ziman û bikaranîna ziman bi xwe ye. Bêguman ciwankarî, zimanşolî û xeberçivîyên di van berhemên da jî tîra xwe ve fikrê piştrast dikin.

Ji ber ku alegorî bi rastxwendina xwendevan a metnê ve girêdayî ye, di vê cureyê da xwendevan di navendê da ye, ango ev cureyeke xwendevan-navendî ye. Ji ber wê Qulligan wekî mirovên jî rêzê li xwendevanên van metnan nanihêre, li gorî wî ew xwendevan, wekî kirdeyeka/i ziman afirandibe û wekî kirdeyeka/i jî hêla ziman ve hatîye afirandin derdikeve holê.

Bêguman, di dabaşa alegorî û alegoriya neteweyî da kesên herî bi nav û deng Friedrich Jameson û Aiaz Ahmad in. Nîqaşa navbera wan di salên 80'yî da dest pê kirîye, lê hê jî tîra xwe xwedî arîşe ye ev nîqaş. Nîqaşê, bi nivîsa Jameson (Di Heyama Sermîyana Pîrnetewe da Edebîyata Cîhana Sêyem) a di hejmarê şazdehan a kovara Social Text da weşiyabû dest pê kiribû û di hejmarê pey ra jî bi nivîsa Aiaz Ahmad (Retorîka Êndinî ya Jameson û "Alegoriya Neteweyî") dom kiribû.

Jameson di nivîsa xwe ya navbihurî da sinorên edebîyata cîhana sêyem xêz dikir û digot:

...hemû metnên Cîhana Sêyem bi awayekî bivê nevwê alegorîk in, bi ser da jî bi awayekî xweser alegorîk in; divê ev, wekî alegoriyên ez ê wan bi navê alegoriyên neteweyî binavînim bîn xwendin. (r:372)

Lêbelê piştî ku Jamesonî ve angaştê dadihêna ferqa di navbera metnên Cîhana Sêyem û metnên aidî Cîhana Yekem jî wiha destnîşan dikir:

Yek ji hêmanên diyarker ên çanda romanên rasteqîn û modernîst yê Bojava jî ferq û derizîna radîkal a di navbeyna ya arizî û ya cimawerî, ya poetîk û politîk, ya di navbeyna qada ku em wekî qada zayendîtî û binhişiyê digirin



dest û qada çîn, aborî û cîhana giştî ya desthilata siyasî a sekûler da ye. (r: 372)

Belê, bi awayekî oryantîst, ji layê Jamesonî ve kêm-zêde çarçoveya edebîyata Cîhana Sêyem tê xêzkirin. Lê belê, jixwe Jameson jî talûke û seqetîya ve angaştê xwe ya derbarê cîhana sêyem de hayedar e. Ji lewra ew çêşiddarî û curbicuriya geşedanên dirokî yên ve cîhanê, yên xweserî xwe jî dizane. Li gorî ve çarçoveyê, metnên takekesî yên bi dînamîkên libîdînal jî hatine pêçan wekî metnên alegoriya neteweyî tîn dîtin. Ji ber wê ye ku li ber çavên Jameson, çarenûsa karakteran her tim alegoriya çand û rewşa civaka wî yan jî wê ye. Eletewşîtiya karakteran eletewşîtiyên civakî ne, ango deriyê tengzarî û janên takekesî li cima'etê vedibe.

Mirov li gorî helwesta Jameson dikare bibêje ku di wêjeya Cîhana Sêyem da, di navbera hêmanên libîdînal û hêmanên politîk da pêwendî û hevahengîyek heye. Ji ber vê hegerê, "pêwîst e meriv psikolojî an jî bi awayekî xweser-tir veberhênan libîdînal di çarçoveyê siyasî û civakî da bixwîne".

Di vê nivîsara xwe da, xala herî zêde Jameson li ser disekine û serê xwe pê ra diêşîne, destnîşankirina jêveqetîna qada takekesî û qada gelemperî ye. Freud bi dahûrandinên xwe yên psikoanalîtîk qada takekesî temsîl dike û Marxî jî bi nixandînan xwe yên li ser pergala aborî û dahênanê çîna kapital û proleter temsîla qada gelemperî dike.

Rexneya yekem a Ahmad ku li Jameson dike li ser binavkirinên Jamesonî ye. Lewra li gorî Jameson

Cîhana Yekem û Duyem bi kapitalîstbûyîn û sosyalîstbûyîna xwe derdikevin holê, lê Cîhana Sêyem bi rêya serboriyên xwe yên digel mêtinkarî û emperyalîzmê derdikeve biwarê rexneyê. Ahmad diyar dike ku welatên Cîhana Sêyem jî bi kapitalîzmê ra di nav pêwendiyên xweser da ne û di bin banê ve pergale da awayên dîtir ên girseyan heye û divê asta beşdarbûna burjuwaziya milî ya bo pergala kapital, guherendiyên wek tîkoşîna çînan a nav neteweyî bi xwe jî neyê paştguhkirin. (berhema Ahmad bnr, r:117)

Mebest an jî daxwaza Jameson saz kirina teoriyekê ye, ya derbarê estetîka birî ya edebîyata Cîhana Sêyem da. Ahmad jî di vir da berê rexneyên xwe li Jameson dike û li ser gengazîya teoriya estetîka birî ya edebîyata Cîhana Sêyem hûr dibê û diyar dike ku ew estetîka birî bi rêya çêşiddariya navxweyî ya Cîhana Yekem û cihêrengiyên di navbera Cîhana Yekem û Cîhana Sêyem da pêk tê. Lê Jameson bi dijberîya Cîhana Yekem û Cîhana Sêyem derdikeve qadê û ve dijayetiye dike dabaşa xeberdanê. Wek ku Ahmad jî derdibirre; Jameson jî bo nîqaşkirina metnên kanonîk yên Cîhana Yekem pêdivî bi teoriya estetîka birî tîne, lê ev berhemên kanonîk dê çarçoveya teoriya estetîka birî tengtir bikin û edebîyateke bi vî erkî radibe dê bi terzek Weberyên bibe sedema hilberandina tîpên îdeal ku li şûna metnên Cîhana Sêyem hatine îqamekirin. Ev jî dibê sedem ku akademîsyenên oryantîst bi bergehên xwe, kevneşopîyê "bala" ya metinxwendîne ava bikin.

Lê kesên wekî Anîa Loomba,

kêşeyên Jameson û Ahmad wekî kêşeyên dê bikaribin li beramberî hev rabin, nabînin. Lewra li gorî Loomba berhemên Cîhana Sêyem jî piştî demekê rexne li îdiayên wekî yegirtin û vegirtinê yên netewe-dewletê dikin.

Digel her tiştî "li hêlekê, romanên Cîhana Yekem ên çawanîya wan a esasî ji romanên rasteqînî vir ve li ser jêveqetandina takekesî û gelemperî ye, ya poetîk û politîk e û li hêla dîn jî metnên Cîhana Sêyem, yên bivê nevwê dîniçînin xala neteweyî-polîtîk û her Freudê tê da bi awayekî jê-neger veguherîye Marksekî kiras-guherandî, hene."

Belê, ne cihê nîqaşê ye ku edebîyata kurdî wek edebîyateka dij û postkolonyal derketîye ser dikê edebîyata cîhanê û hê jî li ser dijkolonyaliya edebîyata kurdî tê nivîsandin. Ji ber vê hindê hebûna alegoriya neteweyî di nav vegêranên bi kurdî da ne cihê şaşwaziyê ye. Divê metelmayîn û nixandînan me bêtir li ser karînan a cureya alegorîk a di edebîyata kurdî da be. Bi we jî berhemên edebî yên kurdî û nexasim jî romanên kurdî bi awayekî bivê nevwê alegorîk in an na?

#### Çavkanî:

- 1- AHMAD, Aiaz, Retorîka Êndinî ya Jameson û "Alegoriya Neteweyî" r: 112-141, di nav Teorîde Sîmf, Uls, Edebiyat, Alan Yayincılık, r:117-118, 1995, İstanbul
- 2- ATİK, Egem, Olsa Olsa Dünyanın Bir Görünümü: Bilge Karasu'nun Gece Romanında Alegori, Sancı Dergisi, hj:14 r:34-38, 2017
- 3- EAGLETON, Terry, Edebiyat Kuramına Giriş, 107-108
- 4- JAMESON, Fredric, Modernizm İdeolojisi, Metis, r:372, 2005, İstanbul
- 5- <https://dergipark.org.tr/tr/pub/iulitera/issue/1241>

# Asayîbûnê rê li ber belavbûna vîrusê vekir

Hikûmetên dewletan çawa ku di destpêka belavbûna vîrusê de xemsar bûn, niha jî di pêvajoya "asayîbûnê" de bi heman ferasetê nêz dibin û civak bi xetereya vîrusê re rûbirû dihêlin

Navenda Nûçeyan

Her çend pêvajoya "asayîbûnê" hat destpêkirin jî hê jî rê li ber belavbûna vîrusa koronayê (Covid-19) nehatiye girtin. Lê niha tenê di rojevê de bangewaziyên bikaranîna maskeyan û paqijiyê tên kirin. Ji ber feraset û zîhniyeta serdestan civak dîsa bi vîrusê re rûbirû ma.

Vîrusa koronayê jî destpê heta îro li 213 welatan bi bandor bû. Li gorî daneyên hefteya borî li Amerîkayê 119 hezar û 941, Îngîlistanê 42 hezar û 153, Brezilyayê 46 hezar û 665, Îtalyayê 33 û 448, Fransayê 29 hezar û 575, Spanyayê 27 hezar û 136, Meksîkayê 19 hezar û 080, Belçîkayê 9 hezar û 675, Almanayê 8 hezar û 927, Îranê 9 hezar û 185, Rûsyayê 7 hezar û 478, Hollandayê 6 hezar û 74, Tirkîyeyê 4 hezar û 861, Swêdê 5 hezar û 41, Çînê 4 hezar û 638, Şiliyê 3 hezar û 615, Pakistanê 3 hezar û 93 û Afrîka Başûr hezar û 674 kesan canê xwe jî dest daye. Bi tevahî li cihanê nêzî 9 milyon kes bi nexweşiya vîrusê ketine û jî 500 hezarî kesî zêdetir jî canê xwe jî dest daye.

Rayedarên dewletan çawa ku di destpêka belavbûna vîrusê de xemsar bûn, di girtina tedbiran de jî dereng man. Niha di pêvajoya "asayîbûnê" de jî bi heman ferasetê nêz dibin. Ligel destpêkirina pêvajoya "asayîbûnê" Wezareta Tendurîstiyê ya Tirkîyeyê hişyariyê din kir. Wezarete behsa xetereyên klîmayê kir û diyar kir ku divê li cihên girtî klîma neyên xebitandin û bila bi vekirina derî û baceyan hewayê hundur bê paqijkirin. Wekî cihên îbadetxane, xanî, metro, restorant, otobus û hwd. Her wiha li gelek bajarên Tirkîyeyê bîrbara bikaranîna maskeyan hat dayîn.

## Hejmar zêde dibe

Piştî destpêkirina pêvajoya "asayîbûnê" li Bakur hejmara nexweşan zêde bû; bi taybetî jî li Amed, Wan û Mêrdînê. Li Amedê hejmara xebatkarên tendurîstiyê yê bi koro-



nayê ketine zêde bû. Li gorî Sendîkaya Kedkarên Xizmeta Tendurîstî û Civakî (SES) ya Şaxa Amedê 150 kedkarên tendurîstiyê bi koronayê ketine. Li Amedê yek jê şef 4 kesên di tesîsa dawerîna avê de dixebitîn bi şewbê ketine. Lê belê Midûriyeta Giştî ya Karên Av û Qenalîzasyonan (DİSKİ) welatîyên bajêr agahdar nekirine û jî bo vê tu tedbir jî negirtine.

## Dêriyên sînor hatin vekirin

Platforma Tendurîstiyê ya Mêrdînê têkildarî zêdebûna vîrusê daxuyaniyek da û diyar kir ku ji bo turîzmê tedbir hatin sistkirin. Li gorî daxuyaniya platformê di hefteya borî li Mêrdînê 60 kedkarên tendurîstiyê bi koronayê ketine. Her wiha vekirina deriyên sînor ên Wan û Îran, Colemêrg û Îranê jî rê li ber belavbûna vîrusê vekir. Li Wanê hejmara nexweşan piştî vebûna deriyên sînor jî bo welatîyên bakur û rojhilatê Kurdistanê xetereyê mezîn e. Lê ji bo rayedarên Îran û Tirkîyeyê ev tişt ne girîng e.

## Li Şengalê tedbir

Li Başûrê Kurdistanê di 14'ê

adarê de qedexeya derketina derve hatibû îlankirin, ev tişt rê li ber belavbûnê girtibû. Li gorî daneyên wezaretê tendurîstiyê ya başûr li herêmê her diçe hejmara nexweşan zêde dibe. Her wiha jî ber qedexeya derketina derve, niha li vir krîzeke aboriyê heye û li gorî daneyan dahata Başûr jî sedî 70 kêmtir bûye û jî sedî 74'ê welatîyan pîrsgirêka aboriyê dijîn. Her wiha li Şengalê jî xebatên di dijî belavbûna vîrusê didomin. Komîteya Tendurîstiyê ya Şengalê li ser rewşa dawî ya herêmê û metirsiya vîrusa koronayê daxuyaniyek da û diyar kir ku heta niha li herêmê kesek nexweş neketiye. Komîteyê destnîşan kir ku her çend nexweş tunebin jî tedbirên tîn girtin didomin. Komîteyê dîsa gel hişyar kir û got eger zêde pêwîst nebe dernekivîn bazarê û bi girseyî li hev kom nebin.

## Li girtîgehan rewşa awarte

Her çend pêvajoya "asayîbûnê" hat destpêkirin jî li girtîgehên Tirkîyeyê hê jî rewşa awarte didome. Li gorî rapora midûriyeta giştî ya ceza û malên tewqîfê, 452 testên girtîyan pozîtîf

derketine. Piştî mudaxaleyê niha hejmar bûye 72. Heta niha 6 girtîyan jî canê xwe jî dest daye. Ligel daxuyaniyên dezgehên fermî yê dewletê, sazî û dezgehên sîvil jî diyar kir ku li girtîgehan tedbirên pêwîst nayên girtin û xetereya belavbûnê hê jî didome.

## 'Girtîyên siyasî berdin'

Piştî daxuyaniya Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KMMK), Zeyneb Celaliyan li Girtîgeha Qerçekê bi vîrusa koronayê ketiye û çalakvanên jin, siyasî, sîvil û kesayetên rojhilatê Kurdistanê jî bo azadiya Zeynep Celaliyan û girtîyên siyasî yê Îranê kampanyayek bi navê "Ji Zeynep Celaliyan re azadî" dan destpêkirin û banga tevlihbûna kampanyayê kirin. Herî dawiyê Zeynep Celaliyan hefteya borî ragihan ku heke wê ji girtîgeha Qerçekê nebin girtîgeha Xoyê dê dest bi greva birçîbûnê bike. Her wiha Komelgeha Jinên Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) û Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) bal kişand ser rewşa girtîyên siyasî ên kurd û got: "Divê hemû girtîyên siyasî yê li girtîgehên Îranê bîr berdan."

# Lihevkirina yekem pêk hat

Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) û Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyeyê (ENKS) bi amadebûna şandeyên ji her du aliyên, tevî fermandarê giştî yê HSD'ê Mazlûm Ebdî û nûnerê Amerîkayê yê Sûriyeyê William Robak derbarê hevdiîtinê avakirina yekitiyê de hefteya borî daxuyaniyek hevpar dan.

Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku qonaxa yekemîn a diyalogên yekitiyê bi dawî bûye û ew gihaştine nêrîneke siyasî ya hevpar û hat diyarkirin ku dê diyalog li ser bîngeha Peymana Duhokê berdewam bike û di rojên pêş de peymanekê giştî were îmzekirin.

Di daxuyaniya hevpar de wiha hat gotin: "Di 16'ê heziranê de şandeyên Meclisa Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyeyê û Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurdî pêvajoya destpêkê

ji diyaloga kurdî bi dawî kir û bi hev re gihîştin nêrîneke siyasî ya hevbeş û lihevkerinê pêşin ku bendên (rêvebirin, hevbeşî, ewlehî û parastin) ên Peymana Duhokê ya 2014'an bikin bîngeha berdewamkirina dan û standin û diyalogên di navbera her du şandeyan de, wê peymanekê giştî di pêşeroja nêz de îmze bikin.

Her du şandeyan tekezî bi hevkarî û yekitiya kurdî li Sûriyeyê kir û ev gav weke gaveke dîrokî ya girîng ber bi lihevkerinê mezintir û hevkarîyê pratîkî di berjewendiyên gelê kurd li Sûriyeyê û hemû pêkhatiyên Sûriyeyê de pêşwazî kirin.

Her du şandeyan ev xebat oxirî cangorîyên mezîn ên ciwan û keçên Sûriyeyê û bi taybetî şehîd û birîndarên rojavayê Kurdistanê û malbatên wan kirin ku jiyana xwe kirin



berdêla şerêkî birûmet jî bo parastina cihanê jî sitemkariya DAIŞ'ê. Ev lihevkerin wek gava yekemîn a girîng e ku em bi sponsariya çîgirê şandeyê amerîkî yê taybet ji Koalîsyona Navneteweyî re balyoz William Robak û fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyeyê Demokratîk (HSD) general Mazlûm Ebdî gihîştin.

Her du şande, ji bo înnîyatîfa wî ya yekkirina rêza kurdî li Sûriyeyê general Mazlûm Ebdî bi rêzdarî spas dikin û jî bo destek û keda wan a di yekkirina rêza kurdî de rêzdar serok Masûd Barzanî û serokê Herêma Başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî spas dikin."

QAMIŞLO

## Ji tifaqa parçeyan ber bi yekitiya neteweyî

Şerê cihanê yê sêyemîn bi hemû lez û beza xwe didome. Her çîqas tansiyona vî şerî mîna ku sist bibe bixuyê jî, rastî cuda ye. Li ser erdê jî aliyê hêzên demokrasî û azadîxwaz ve şerêkî bêman e hebûnê; jî aliyê desthilatdar û serdestan ve jî şerêkî hovaneyê parvekirinê didome.

Hindik maye sedsala Lozanê biqede, lewre her diçe xedariya şer bilindtir dibe. Dewleta tirk a serê sedsala borî weke cendirmeyê vê pergale hatî avakirin û peywidarkirin; li ber çavan bi vî sistemê re weke ku nakokîyan dijî bixuyê jî, hêj xwedî heman peywidarî ye. Dewleta tirk a xwedî xewn û xeyalên hegemonyaya herêmî, jî ber vî asûna xwe û bi îcazeta ji zilhêzan girtî, dixwaze gelê kurd û destkeftiyên wî tune bike û sedsala ditir jî hebûna xwe li ser çîrkirina gelê kurd û Kurdistanê saz bike! Lê belê ne sedsal ew sedsal e, ne jî kurd kurdên sedsal berê ne! Kurd li çar beşên welat xwedî danehevî û destkeftiyên 200 salî ne. 200 sal in bê navber li ber xwe didin û bûne xwedî azmûneke girîng a siyasî, leşkerî, îdarî; dîsa bir û perspektîfêke dîrokî û nihayî... Bi gotineke ditir, aqil, hest û helwesteke kolektîf a kurdan çêbûye. Dibe ku ev aqilê hevpar e kurd hêj xwe baş rêxistin nekiribe, lê heye: Di nav civakê de heye, di nav hêzên kurd de heye. Li ser yekitiya neteweyî gotinên nehati gotin hema bêje nemane. Bêguman heta pêk bê divê gotin neqedin jî. Gotinên me jî rêxistin û hêzên muxatab re ne. Ev daxwaz û banga gel e! Tu hincetên tu aliyî nîne ku sedsaleke din jî gelê kurd bibe qurbanî, di bin nîrê dagirkeran de bê perçiqadin, rûmeta wî bê şikandin! Heke îro, jî dewleta tirk bigire heta Îran û Iraqê, heta Sûriye neyartiya kurdan dikin û êrişên tunekirinê tînin ser destkeftî û hebûna kurd; divê tu "pîrozî, rêgez, hesab, berjewendî" yê tu aliyên ji nîrxên neteweyî girîngtir nebin. Ji niha pê de ki vî bike, dev ji hevkarî û nokeriya dijmînan berde, ki bêdeng, bêhelwest bimîne, divê ji kurdên, heta ji mirovbûna xwe şerm bike! Belê, di dîroka nêz de nêzî 40 sal in "Yekitiya Neteweyî" di rojêva rêxistin û gelê kurd de ye. Heta niha berhevî û serpêhatiyêke baş jî çêbûye. Heke armanca her kesî gel û welat be; wê demê gel êdî yekîtî, azadî, serxwebûn û serfiraziyê jî we dixwaze!

Li bakurê Kurdistanê heta astekê tifaqek nav hêzên kurdî de çêbûye û li hemberî dagirkerî û faşîzmê helwesteke hevpar derketiye holê. Li rojhilatê Kurdistanê jî bi heman awayî di navbera hêzên kurdî de tifaqêke bi vî awayî ya pratîkî çêbûye. Li başûrê Kurdistanê ev demeke dirêj e ku ev xebat tên kirin. Her çîqas encamên berbiçav dernekîtinê holê, nakokî hebîn jî, gel wan nakokîyan rast nabîne û nakokîyên ku neyên derbaskirin nînin. Nişaneya vî berbiçav jî, li hemberî hewldanên dagirkeriya dewleta tirk di serî de li Silêmaniyê, li seranserê başûrê Kurdistanê gel bi hêrs û kîn e.

Li rojavayê Kurdistanê aliyên kurdî li ser xalên esasî li hev kirin. Belê, ev lihevkerin weke peymanê du aliyên siyasî be jî, dikare weke tifaqa başûr û rojavayê Kurdistanê bê nîrxandin. Ev hewldana bi pêşengiya fermandar Mazlûm Ebdî pêk hatî, dikare weke qonaxêke girîng a vî pêvajoyê bê nîrxandin. Ev jî kelecana dîde hemû kurdan. Bi kurtasî ev lihevkerin dikare weke gaveke girîng a ber bi yekitiya neteweyî ya çar parçeyên Kurdistanê ve bê ditin û piştigirîkirin. Bi vî awayî dorpeç û êrişên çîrkirinê bîr şikandin û gaveke dîrokî ya ber bi azadiya neteweyî ve bê avêtin.



Mem Avba

# Ji bo pêşerojêke demokratîk meşîyan

HDP tevî zext û astengiyan "Li dijî darbeyê meşa demokrasiyê" li dar xist. HDP'î ji Colemêrg û Edîrneyê heta Enqereyê meşîyan û xwestin bibin dengê gel, kedkar, karker, xizan û bêkarên bi hinceta vîrusê hatine dorpeçkirin

Navenda Nûçeyan

Di pêvajoya vîrusa koronayê de ji rojeva kurdistanîyan neguherî. Hêzên demokratîk, muxalif û azadîxwaz di pêvajoya vîrusa koronayê (Covid-19) de ji bi politikayên êrîş, zext, binçavkirin û girtinê re rûbirû man.

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) partiya sêyemîn a Tirkîyeyê ye û ji ber politikayên xwe her tim ji hêla desthilatê ve hedef tê nîşandan. Bi dehan car xebatkar, endam, rêveber, hevserok, hevşaredar, parlamenterên partiyê hatine girtin. Desthilatê qeyûm tayînê 45 şaredariyên HDP'ê kirin û parlamenteriya Leyla Guven û Mûsa Farisogullari betal kir. Hevserokên HDP'ê yê berê Figen Yuksekdağ û Selahattin Demirtaş, hevseroka giştî ya DBP'ê (Partiya Herêmên Demokratîk) ya berê Sebahat Tuncel û hevşaredarên Bajarê Mezin ên Amedê Gultan Kişanak û Adnan Selçuk Mızraklı, hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Bekir Kaya û Mûsa Farisogullari yê parlementeriya wî hat betalkirin girtî ne. Ligel girtin û binçavkirin, li gelek bajaran êrîş birin ser avahiyan HDP'ê ji. Ligel zext û zordarî û xetereya vîrusê HDP'ê li her qadê hewl da ku bibe dengê gelan.

Her wiha di dema vîrusê de pirs-girêkên civakî, siyasî, aborî girantir bûn û desthilata AKP-MHP'ê her roj bi politikayêke cuda êrîşê gel, xizan, kedkar, karker û bêkaran kir. Li dijî vîrusê HDP'ê di 1'ê heziranê de bi navê "Bi hev re ber bi pêşerojêke demokratîk ve" belgeya xwe ya helwestê û xeta stratejiya dema nû aşkera kir. Piştê jî Desteya Rêvebe-

riya HDP'ê biryara "Li Dijî Darbeyê Meşa Demokratîk" wergirt. Meşa HDP'ê 15'ê heziranê ji Colemêrgê û Edîrneyê hat destpêkirin û di 20'ê heziranê de ji li Enqereyê bi dawî bû.

## Guh nedan astengiyan

Meşa tevî zext û zordariyan di nav raya giştî û gel de bi çöseke mezin hat pêşwazîkirin. Desthilatê bi her awayî xwest meşê asteng bike û medyaya xwe ya alîgir xist dewerê. Pêre ji êrîşên pîralî li hemberî HDP'ê hat destpêkirin. Meşa ji Colemêrgê hatibû destpêkirin li Wan, Tetwan, Bedlîs, Êlih û heta Amedê di nav zextan de pêk hat. Girseya meşê li Hezoya Êlihê û li Bismila Amedê bi êrîşeke tund re rûbirû ma. Hemû bajar û navçe ji hêla polîsan ve hatin dorpeçkirin. Meşa ku ji Edîrneyê dest pê kir, bi heman êrîşan re rûbirû ma û bi her awayî hatin astengkirin. Lê li bajaran welatî tevî astengiyan bi heycan û çöseke mezin HDP'ê pêşwazî kir. Heyetên ku di meşê de cih digirtin dema li bajaran rawestiyên ji bi sazî, dezgeh û rêxistinên sivîl re civîn li dar xistin.

## 'Ji talanê rizgar bibin'

Tevî meşê, mijarên di belgeya HDP'ê de cih girtin jî girîng bûn. Belgeya bi navê "Bi hev re ber bi pêşerojêke demokratîk ve" hat weşandin de wiha tê gotin: "Em zextên li hemberî ziman, çand, bawerî, zayend, tarzê jiyane, tercih û lixwekirina kincên xwe qebûl nakin. Bêyî em hinekan veder bikin û bèn vederkin; em bi biryar in ku bi awayekî azad fikrên xwe û bi zimanê dayika xwe mafê xwe yê îfadekirinê biparê-



## Ji Meclisa Jinan a HDP'ê kampanya

Li Tirkîyeyê politîka û gotinên desthilatdariyê, biryarên darazê û nêrinên zayenda civakî şideta li ser jinê zêde dikin. Di pêvajoya vîrusê de jî jinên li malê man zêdetir bi şidete re rûbirû man. Tu navnîşan ji bo jinên bi şidete re rûbirû man nehatin nîşandan. Bi destê qeyûman xebatên jinan hatin bidawîkirin û sazîyên jinan hatin girtin. Meclisa Jinan a HDP'ê tevî xeba-

tên giştî yê HDP'ê bi navê 'Têkoşîna jinê li her derê ye' kampanyayek da destpêkirin.

Li hemû herêman starta kampanyayê hat dayîn û banga mezinkirina têkoşinê jî hat kirin. Kampanyaya jinan dê bi 4 merheleyan pêk bê. Dê her hefte mijarekê bigirin dest û der barê mijarê de jî dê bername sazkin û çalakî bèn lidarxistin. Dê di hefteya

yekem de li ser pêşnûmeqanûna "Efûkirina tecawizkarên zarokan", hefteya duyem der barê qanûna înfazê de ya bû sedema berdana gumanbarên şideta li hemberî jin û zarokan, di hefteya sêyem de dê tayînkirina qeyûman, xespkirina îradeya gel û di hefteya çaremîn de jî li ser mijara qirkirina jinan bèn rawestandin.

zîn û wisa jî bijîn. Sedema krîzê ew e ku berhemên madî û menewî ku ji aliyê civakê ve hatine afirandin ji bo hewcedariyên civakê nayên xerckirin û her wiha hemû tiştî pêşkeşî komeke biçûk dikin ên çavên wan têr nabin. Hebûnên cemaweriyê ku bi bacên me hatine avakirin di bin navê 'tedbîrên krîzê' de pêşkeşî xwedî-

yên sermayeyan dikin û em vî yekê qebûl nakin. Ger pêşî li nelirêfî û îsrafan were girtin û em ji pergala talanê rizgar bibin wê demê dê krîz bi dawî bibe. Ev dê hêviyên gelên me û herême mezintir bike û ji bo hemû mirovahiyê bibe mînak."

Di belgeyê de hat diyarkirin ku bi zextên siyasî, berterekirina

TBMM'ê û tayînkirina qeyûman re armanc dikin ku gav bi gav pergala diktatoriyê ava bikin û wiha tê gotin: "Desthilatdar di her firsendê de hemû derdorên muxalif wek 'terorîst' û 'xayîn' îlan dike û ji bo bédengkirina civakê nexweşiya koronayê hincet nîşan dide û ji bo darbe li siyaseta demokratîk bixwe tevdigere."

# Nijadperestiya li hemberî kurdan zêde bû

Dilgeş Aksu

"Veke dilê xwe tirkê kedkar, mandekirina kurdan xwekuştina te ye." Her çend ev helbesta ji hêla Şafak Tamer ve hatî nivîsandin rewşê eşkere dike jî pêwîst e em piçekî vekin. Mêtîngerî çiqas bi rojane bidome, karker û kedkarên dewleta metînger ew qas bi şoveniyê tî jehrîkirin. Di pêvajoya karantînayê de ku bikaranîna medyaya civakî xurtir bûye, rewşa înkâr û erîşkariya mêtîngeriyê xwe da der û gelek karkerên tirk bûn şahidê vî rewşê. Bi vî rengî me dît ku mêtîngerî ne tenê siyaseta dewletê tirk e, yê li dijî vî rewşê der-nakeve.

Qetilkirina George Floyd ê ji hêla polisê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) ve careke din li DYA û gelek welatên cihanê bû sedema serhildanê gel. Serhildana ji hêla reşîk û spiyan ve li DYA'ye hat destpêkirin li welatên curbicur belav bû. Di çalakiyê de bi dirûşmên "Ez nikarim bêhnê bigirim",

"Dad tune be, aşî jî tune ye!" ber bi navendên kapîtalîzmê ve meşîyan. Her çend li DYA'ê Trump û alîgirên wî jî "AntiFa" re got "terorîst" jî, çalakvanan gav paşde neavêt; ji ber ku pirs-girêk nijadperestî, birçîbûn û xizanî ye. Nimûneyên mîna polis û gelên spî ku li dijî vî berxwedanê "çok danîn" û pişt-girî da çalakvanan dikare nîşanî neteweyên ku zordarî li ser nijadekê dikin bibe mînak.

Desthilatdarên dewletên din ên kuştina George Floyd şermezar dikin û gotinên li dijî nijadperestiyê bi kar tînin, çavên xwe li politikayên nijadperest û înkârê yê li welatê xwe digirin. Yek ji wan jî dewleta tirk û serokê wê Erdogan e. Bêguman, tiştê ku me ji Erdogan hêvî dikir ev bû, lê kedkarên tirk!

Piştî kuştina George Floyd, li Enqereyê Barış Çakan bi sedema guhdarîkirina li stranên kurdî ji dilê xwe hat kêr kirin û canê ji dest da. Bi milyonan kedkarên tirk rondikên sexte li ser George Floyd barandin. Ew kedkarên tirk ên bi rastîya sedema kuştina Barış Çakan dizanin, hevkarên dewleta mêtînger û dest-

hilatdariya wê ne; ew dewleta bavê wî bédeng kir û vegotinên wî pê dan guhertin.

Bêguman, gelek mînakên mîna Barış Çakan hene. Em dibin şahidê nijadperestî û politikayên înkârê yê li ser kurdan ku her roj pêşve diçin. Politikayên, mandekirin, neqanûnkirin û tunekirina kurdan, bîrdoziya burjuwaziya rojane ne. Em dibêjin bîrdoziya burjuwaziye jî ber ku nijadperestî û metîngerî bîrdoziya burjuwaziye ye.

Li Bursa û Amedê di heman rojê de du polis mirin. Polisê li Bursayê mir pir bal nekişand û nebû rojevê lê polisê li Amedê mir bû "qehreman" û ket rojeva welêt. Kesê bi îdiaya gule berdaye polis û polisêk pê hatiye kuştin, li qereqolê îşkence lê hat kirin û wênayê dema îşkece lê hatiye kirin hat weşandin. Bi sedema kuştina polis deriyê mala kesê gumanbar hatin şikandin, li malbatê bi kûçikan îşkence hat kirin. Polîsan bi ser nêzî 20 malan de girt.

Ciwanê tê îdiakirin ku gule li polîsan barandiyê, piştî hate girtin wênayê wî bi rêya çapemeniyê we-

şandin. Ev hemû tenê li ser îdiayekê hatin kirin. Biryara nepeniyê ji bo dozê hat wergirtin û ser rastiyê hat nixumandin. Ji ber vî yekê îhtimal heye, ew ciwan li hemberî êrîşa polîsan xwe parastibe. Dibe ev komployek be û bêguman heger wisa be, ev komplo wê li ser gelê kurd bihata listin!

Piştî darbeya 4'ê mijdarê, bi derbeyek din parlamenteriya parlamenterên HDP'ê Leyla Guven û Mûsa Farisogullari û parlamenterê CHP'ê Enis Berberoğlu hat betalkirin û ew hatin girtin. Baş e dema ev tişt çêbûn karker, kedkar û çepgirên tirk çî kirin? Li hemberî vî îşkençeyê "çok danîn" û jî gelê kurd lêborîn xwestin? An jî li kolanan ji bo Barış û qurbanîyên teqîna li Amedê ya 5'ê heziranê dad xwestin? Mixabin ev nehatin kirin û nijadperestiya li dijî kurdan zêde bû. Gelê tirk careke din bi mendelakirina/înkarkirina gelê kurd re "xwekuji" kir.

Çepgirên kedkar jî tenê li ser medyaya civakî îtiraza xwe anîn ziman. Hin komên çepgir ev yek jî nekir. Çawa ku dîtina George Floyd

lê nedîtina kurdan ji bo kedkarên tirk şovenîzm be, ji bo çepgirên kedkar jî şovenîzmek e. Ji bo hemû komkujiyan deng bilin dikirin çiqas şoreşgerî be; bédengiya di salvegera qetlîama li Amedê, bédengiya ji bo Barış Çakan û bédengiya li kuştina kurdan meylên şovenîst in.

Serkeftina hîlbijartina 7'ê heziranê 2015'an a HDP'ê derfertên nû yê têkoşina demokrasiyê ji gelên Tirkîyeyê derxistin holê. Divê were zanin ku ji bo biratiyê wekhevî, aşî û zadî pêwîst e. Divê HDP û rêxistinên şoreşger li gor şert û mercên nû ji bo vî yekê hîn zêde tîbikoşin.

Tiştê divê bê nîqaşkirin, ne gelê kurd e, gelê tirk ê di bin bandora şovenîzmê de ye. Li dijî mandelê û metîngeriyê, kedkarên tirk deyndarên lêborîna ji kurdan in. Ne bi devkî lê bêguman ev di pratîkê de dikare pêk were.

Spîyên ku ji bo George Floyd "çok danîn" û lêborîn xwestin, divê ji bo gelê tirk bibin mînak da ku ew jî dikaribe xwe ji bin nîrê desthîlatiya dewleta tirk rizgar bike û bi vî awayî li vî welatî jiyaneke di nav aramiyê de pêk were.

# Çend gotin li ser guman, bîr û cerebeyê

Helîm Barîn

## Guman


Fîlozofî bi gumanê dest pê dibe. Ên ku ji tu tiştî guman nakin, hewce-dariya wan bi fîlozofiyê jî tune ye. Hemû pergal û paradîgamyên wek ol, îdeolojî, zanistî jî béguman bi gumanê dest pê kiriye. Îbrahîmî jî piroziya Nemrûdî guman nekira, belkî wan olên sereke jî dest pê nekira. Sokratî jî zanebûna xwe guman kir. Bi vê rêyê bûbû zanayekî biesl. Descartesî kûrtir kir; jî hebûna xwe guman kir. Despêka fîlozofî ya modern jî wî dest pê dibe. Rewşenbîrên Fransayê (Voltaire, Rousseau, Diderot) hemû jî guherîna dinyayê bi gumanê hewl dan têbigihên. Ciyê guman lê tune be ev yek tê wateya ku li wir desthilatdarî serkeftî ye. Guman, çîrûska destpêka serhildanê ye.

Tiştên mirov rastiya wan jî xwe re nekiribe meraq û qet li ser wan tiştan bi ramanan neketibe, bi çî awayî dîtibe û wisa qebûl kiribe, jî karekera zanînen wiha re mirov dikare bibêje dogma. Dogma, zanîna derfîlozofiyê ye. Li cihên dogma hene, fîlozofî li sirgûnê ye. Dînamîkên di nav fikrên me de yên bi pirsan wan dogmayan jî hev dibe û bi vî awayî wan dogmayan tîne asta zanyariyê guman e. Zanyariya béguman hatibe fêrbûn, ne zanyariya ye. Ev dibe zanistî be, civaknasî be, çî dibe bila bibe, divê tiştê ku mirov fêr bibe, di bêjînga aqil-gumanê re derbas bike, an na ew tişt matematîk be jî nabe zanyariya... Pirs guman e û guman xercê fîlozofiyê ye. Çimkî di dîroka şaristaniyê de hemû desthilatdar bi rêya heqîqeta saz kirine, hemû bersivan li gor berjewendiyên xwe yên desthilatîyê dane. Guman, pirs, fîlozofî tîne mehkumkirin. Desthilatdar nexwaze û nahêle serê mirov tevlihev bibe. Paraznamaya Sokratî bixwînin; li wir, em ê bibînin ku Sokrat bi sucê tevlihevkirina serê ciwanan tê darizandin û dûre jî tê kuştin. Lê em dizanin ger serê mirovan, beriya zelal bibe tevlihev

nebe, ew serî pûç e, vala ye. Ger em li nûçeyan binêrin, baş xuya dibe ku sedemên hemû tevliheviyên civakî jî serê zelal û bêpîrs û "béguman" derdikevin. Elbet îtiraza Marxî ya bi navê teza 11' mîn em jî bîr nekin: "Fîlozofan, ev دنیا bi awayên curbicur şîrove kiriye lê girîng guhertina wê ye." Ji bo ku guman û pîrsên me nebin (entellektuelîzm) lewçetî divê berê me bide tekoşîna guhertina civakê. Ji bo me jî hilweşandina pergala mêtîngeryê jî encax bi tekoşîna li ser esasê van pîrs û gumanên li ser vê pergalê mimkun e.

## Bîr û cerebe

Bîr, warê serpêhatîyan e. Tiştên em jiyane, tiştên ku em hîn bûne û tiştên ku buhurîne, li bîrê tîne tomarkirin. Mîrov bixwaze dikare tiştên ku li bîrê hatine tomarkirin bîne ser hişê. Tekiliya dema bihurî (paşeroj) û niha bi saya bîrê çêdibe. Li gorî min hiş perçeyê çalak ê bîrê ye. Ji ber vê yekê bîr û hiş carna tevlihev dibin û li şûna hevdu jî tîne bikaranîn. Serpêhatî (serborî, bîranîn) di erebî de (di tirkî de jî) xatira ye. Rayeka vê peyvê xatir e. Wateyên xatirê gelek in: aqil, dil, qedir, rewş, fikir. Peyva xatirê di zimanê kurdî de jî heye. Em jî bo yekê/î qanî bikin em jê re dibêjin "Ji bo xatirê Xwedê". Her wiha em kengî jî hev diqetin "xatir" jî hev dixwazin. Ev peyva xatirê bi peyva xatirê re girêdayî ye û xatira jî jî peyva hafîzayê ango bi bîrê ve tîkildar e. Wan tiştan jî bo vê yekê dibêjin: bîr bi aqil, dil, qedir û fikirê ve pêwendîdar e. Vêya tê vê wateyê ku tiştên bi aqil, dil, fikir û tiştên bi qedir ve tîkildar di bîra me de cih digirin. Bîr di îngilîzî de jî memory ye. Lê peyvek hemwateya wê ya din heye ku em ê pirtir jê sîd werbigirin: Recollection (ji wateyên vê peyvê yek jî "bibîrxistin" e.) "Re" pêşgira vê peyvê ye ku bi wateyên "cardin, dubare" ye. Collection, koleksiyona (hevanî, berhevok) em dizanin e. Koleksiyona pereyên kevn, trêmbêlên antîka hene. Bîr jî, koleksiyona jiyînê ye, ango koleksiyona



serpêhatîyan e. (Ji bo vê meseleyê mirov fehm bike pirtûka Rênas Jiyan a Mehzena Xwîne berhemeke pir baş e. Rênas Jiyan bi vê berhemê serpêhatîyên xwe gihandîye asta cerabeyan û bi civaka xwe re parve kirine) Her çîqas vê berhevkirina serpêhatîyan jî ber xwe, bi jiyînê ve pêk were jî, jî bo jiyânê jî koleksiyona erebên kevn bi qîmetir e. Heger mirov li ser vê koleksiyona serpêhatîyan bifikirin, heger ava vê bîrê bi fîlozofiyê re were vexwarin, ew ê statuya serpêhatîyan bigihê asta cerebeyan. Cerebe, çavkaniyeke çêkirina zanyariyê ye. Rast e; divê mirov nîqaş bike, gelo vê zanyariya mirov bi rêya cerebeyan tedîgîhêje çî qas ewle ye? Lê beriya wê divê cerebeyên me hebin ku em nîqaş bikin. Me pir bihîstîye, pir kes dibêjin 'jiyana min were nivîsandin, ew ê bibe roman'. Lê belê yên romana xwe xwendibin û jî vê romanê encam derxistibin, ew xwediyên cerebeyan in. Li cem wana belkî hinek bersivên jiyânê hebin. Lê yên haya wan jî ro-

mana nivîsandine (jiyan) tune be, ferqek wan jî ajalane tune ye. "Jiyana ku nehatiye pîrsiyarkirin, hewce nake bê jiyîn." (Sokrates) Ajal tenê dijî, lê mirov dijîn û diponijîn. Ponijandin jî nav çawaniyên mirovan were derxistin, tu ferqa mirov jî ajalane namîne. Ajal û her wiha xweza wek xwe ne; mirov, xwe ava dibe. Ponijandin ne wek mil û bask e, ew wek şîyan (potansiyel) di mirov de heye, yên wê şîyanê çalak nekin, jî mirovbûna xwe perçeyekî jê dikin; û jî ber vê, divê jî xwe re bi rehetî nekare bibêje "ez mirov im". Tiştên mirov dijî dibin serpêhatî; heger em li ser serpêhatîyên xwe bifikirin û jî wan encaman derxin, wê çaxê serpêhatî dibin cerebe. Ji ber vê yekê serpêhatî sermiyana me ya jiyânê ye. Mirovên ku jiyana xwe biçûk bibînin, li ser jiyana xwe nafikirin û napeyivin, jî ber vê yekê ew nikarin jî jiyana xwe cerebeyan çêbikin. Ji aliyê din ve jî jî bo ev tişt biqewime, ango mirov li ser xwe nefikirin desthilatdar bi hemû hêza xwe dişuxilin. Bi her awayî vê peyamê didin:

"Hûn nezan in, zanyarî di destê min de ye. Encax bi dîplomeya (bawername) ku ez bidim, hûn dikarin bizanibin û biaxivin." Dîplome dibe pîvana zanyariyê û yên bê dîplome ne, tev dibin nezan. Ji ber ku zimanê dîplomeyê jî tirkî ye, pîvana zanyariyê dibe tirkî û ya nezaniyê dibe kurdî. (Ji bo vê meseleyê li pirtûka Bahoz Baranî ya Ferhenga Bişaftîne binêrin) Ji ber wê her roj di kanalên mêtîngeryê de ku wek kanalisazyonê van profesorên ehmeq derbixin û gel qanîh bikin bo siyasatên xwe. Bi kurt û kurmançî jî bo civakên wek me çavkaniya zanyariyê ya sereke bîra me ye. Serpehatîyên me ne. Xwendin elbet girîng e lê jî bîr nekin Schopenhauer (1788-1860), xwendina bêponijandinê wek ehmeqî dibîne. Kant (1724-1804) nabêje rewşenbîrî xwendin e; li gorî wî rewşenbîrî wêrekiya bikaranîna êqil e (Rewşenbîrî çî ye?). Yek jî çavkaniya zanyariyê jî cerebe ye. Ji ber vê yekê nezan ne ye pirtûk nexwendine; ew ên li ser jiyana xwe qet nefikirîne nezan in..

Berhemên edebî belgeyên zindî yên dîrokî ne. Bi taybetî jî bo xebat û tîgîhîştina sosyolojîya civakan xwedî cihê girîng in. Her wisa gelek dane-yên psikolojîk ên derbarê rewşa civakê de jî di berhemê de xwe didin der û jî bo serdemên dîtir wekî kodên dîrokî dimînin. Di gelek waran de mirov bi saya wan berhemên hewl dide da xwe bigihîne psikolojîya nivîskar û di ser nivîskêr re jî xwe bigihîne serdemên nivîsandina berhemê.

Gelek berhem bi şêwe û ekla xwe bala mirov dibe ser wê taybetmendîya edebîyatê.



Sîdar Jîr

## "Hefsar" belgeyêke zindî ye

Li dinyayê gelek mînakên bi vî rengî hene. Di kurdî de jî mînak hene helbet. Yek jî van romanên jî "Hefsar" a Hesênê Metê ye.

Di dema xwendina vê romanê de, lehengê Hesênê Metê; Germîyan, bêyî hemdê xwe lehenga romana Toni Morrison; Sethe (romana "Beloved") tîne bîra mirov. Sethe, rêwîtiyeke dijwar, asê, dîr û dirêj didomîne – ji koletiyê ber bi azadiyê ve. Béguman Sethe û Germîyan yek bi yek ne mîna hev in, lê ew lêgerîn û berxwedana jî bo azadiyê reşik û kurdan jî di xalekê de digihînin hev.

Lehengê "Hefsar" a Hesênê Metê; Germîyan, samboleke axa bindest e. Di serî de wekî berdêl; malbata xwe, jîn û zarokên xwe li ser axê kiriye, paşê jî psikolojîya/derûniya xwe - axir di talîyê de jiyana xwe jî li ser dibe... Psikolojîya bi navê Monica Bogren, hewl dide psikolojîya Germîyan baş bike ku jî welatê xwe dîr ketiye û psikolojîya wî xerab e. Germîyan gelek caran serî lê dide, diçe û tê wekî lewlebê. Talîyê, gava fam dibe êdî rêbazên "zanistî" yên wî welatî bi kêr nayên, xwe dia-veçe dext û bextê dengbêjan. Meseleya nivîskêr, di vir de ne dengbêj û psikolog û qedêr û Xwedaya yan jî tiştêkî din e! Dema ku xwîner bi baldarî

Hefsarê dixwîne, tîdigihîje ku jî serî heta binî hewldana nivîskêr bo kodên civaka kurdan e. Çûn û hatina Germîyan, êşa wî, xerabî û tiştên hatine serê wî, êdî hefsar jî mista nivîskêr derdixê û dide mista xwîneran. Berxwedana Germîyan a ji koletiyê ber bi azadiyê ve dibêze, di hêla ku xwîner Hesênê Metê (nivîskar) jî nav xwe û lehengê romanê derxe – yan jî nivîskar jî serî de ev destûr daye xwendevên û xwe jî navê vekîşandîye. Béguman ev jî bo romanê serkeftînek e.

Diyarkarî/determînzîma nivîskêr, piştî demekê êdî sîmbolik dimîne. Hostetîya nivîskêr, bi vebêjî û vegêrana xwe xwîner dixê nav lepên pirtûkê. Ji welatên kurdan heta Ewropayê awaza dengbêjan di mejîyê Germîyan û xwîneran de olan dide.

Nivîskar tîgîhên mîna zozan, dengbêj, bîrkîrîna welêt, hezkirin, êş, mirîn û hemû tiştên ku dikarin werin serê lehengekî mîna Germîyan, gelekî bi xurtî û hostetî bi kar anîye. Béguman Hesênê Metê dikaribû xwe tevlê bikira û qedera Germîyan biguheranda, lê hostetî di demên wisa de diyar dibe. Nivîskar hiştîye lehengê wî piştî hemû berxwedan û hewldanan wekî kesekî jî

rêzê bimire. Ew mudaxilî xwekuştîne jî nebûye. Heke nivîskar bi heştîyarî tevbigeriya, xwîner nikaribû ew jî nav xwe û Germîyan derxista. Dûrbûna jî axê dikare nivîskêr bike temaşevanek jî. Ev ne tiştêkî xerab e; jî dêvla nivîskar mudaxalkar be, temaşekar be çêtir e.

Kesên Hefsar xwendine, kêliyêkê çavên xwe bigirin û bi awayekî fîzîyolojîk li dûrbûna welatê xwe bifikirin – li dûrbûna xwe. Béguman gava em bifikirin em ê hemû bibin Germîyan. Axir xwîner jî bi Germîyan re li ber xwe dide...

Hêma û sîmbolên di Hefsarê de ew ê çîqasî jî aliyê kesên ne kurd ve werin fêmkirin, nîzanim. Lê gelekî diyar e ku Germîyan ne tenê lehengê Hesênê Metê ye. Ma jixwe ev bi tena serê xwe ne gelek tişt in gelo? Diyarkirina encama romanê yan jî ya jiyana Germîyan ne xem e, lê jî aliyê antî-koloniyalîzmê ve çî dide xwîneran? -berxwedana ku xwîner û leheng bi hev re, berhemê dîke metneke dij-koloniyalîst. Béguman ev yek nişaneyê xurtîya pênûsa Hesênê Metê ye. Dibe ku êşa me û reşikên jî nêzî hev dibe... Jixwe Toni Morrison û Hesênê Metê jî wekî hev "reşik" in. Belkî zêde 'objektîf' be, lê her du jî, bi metnên xwe 'reşik'ên gelekî 'xweşik' in...

Kî dizane belkî ev jî yek jî wan berhemên be ku jî nîfşên piştî me re bibe yek jî belgeyên zindî – te di ew nîfşên ku "hefsar" qetandibin û li zozanên welatê xwe azad dijîn.

\*Hefsar, Hesênê Metê, Roman, Weşanên PEYWEND, 2018



# Averşîyîşî ma rê çî ard

Serhat Kiliç

Nuştox Yuval Noah Harari kitabê xo yê Homo Deusî de vano ke “heta na seserra peyêne hîrê problemê eslî her tim biyê belayê serreyê merdimîye: xela, jan (nêweşîyê ke vila benê) û ceng.” Ez do bi çend cumleyan nînan ser o vîndera. Beno ke neslê neweyî xela nêdîyo la ez bawer kena ke ma zaf pê hesîyayê. Xela hukmêdê pîlî şarî ser o ronayo, ziwanî de gelekî îdîyoman de yan zî qaliban de ca girowto, sey xela ra veradîyene, gêstî ver o merdene ûsn. Nînan ra teber eke ma kokîman ra biewnê ma eşkenê tersê xelayî bi asanî bivîne. Vîrê merdimîye yo hempare de tesîrê xelayî zaf o. La na seserra peyêne de êdî zîret hina bi zanistî beno, îmkânê awdayîşî zêdîyayê, verba nêweşîyanê zîraîyan dermanî biyê vîş. Êdî ma eşkenê vajê ke kapasîteyê werdî deste însanan de yo. Nika êdî merdimî gêstî ver o nê zafwerdîşî ver o mîrenê, nêweşîyê obezîteyî yan zî yê dîyabetî dinya miyan de çend vila bîya ma pêrunê rê ayan o.

Heta bine ra cengan zî serreyê merdimîye zaf dejnayo. Cê ke tarîx nusîyayo her tim behsê cengan bîyo, seke ma wanenê dinya bê-ceng nêmena. Tarîxo resmî yan zî mavajê yê dewletan, tarîxê cengan o. Dinya tena heta nêweşîyê seserra 20ine de di heb cengê dinyayî dîyî, înan ra yê yewînî de 40 milyon, yê dîyînî de 55 milyon merdimî merdê. La no bîyo 70 serrî yo ke êdî yew cengo pîl nêvirazîyayo. Cengê lokalî reyna benê, taybetî rojhilato miyanên wareyê nê cengan o, la belê hûmara însanan a ke nê cengan de dinyaya xo bedîlînenê kêmî ya, sey cenganê verênan nîya.

## Belayê serreyê însanan jan o

Problemo bîn o ke bîyo belayê serreyê însanan jan o. Taybetî cê ke merdimîye resaya deraxa şarîstaniye nêweşîyê ke bi hewayêdê janî kewtê miyanê şarî vejîyayê. Ma tarîx ra zanê ke gelekî merdimî bi nê nêweşîyan merdê. Seserra 14ine de goreba daneyanê tarîxîyan ma-



bênê 100 milyon û 200 milyonî merdimî tena janê vebayî ver o merdê. Seserra 14ine de ma eşkenê vajê hema hema nêweşîyê nufusê dinya janî ver o merdo. Ewro nufusê dinya 7 milyar o, nêweşîyê ci keno 3,5 milyar merdimî, êdî şima bihesebnê xezebêda senîn bîya.

## Nufusê dinya yê pêroyî

Seke kitabê xo de ey vatêne êdî ê çîyê ke mi humarîtî sey verê merdimîye ser o problemî nîyê, se ra se nêbo zî merdimîye verba nê probleman ser kewt. Raştî zî ma biewnê nufusê dinya yê pêroyî ra 1800 de nufusê dinya 1 milyar o, 1900 de 1,5 milyar, 2000 de beno 6,1 milyar, vîst serran ra pey ewro 2020 de nufusê merdiman reseno 7,8 milyarî. Humarî ma rê nawnenê ke dinya ser o çî rey sey na seserra peyêne nufus hende lez nêzêdîyayo. Miyanê se serran de nufus hewt hend bîyo vîş.

## Zanist, teknoloji û tib

Se bi ke çerxê dînya yê hezar serran wina xafîla tadîya? Gelekî çîyî cirîyayê la ez vana qey miyanê înan de tewr zaf averşîyayîşê zanist, teknoloji û tibî nê vurîyayîşan ser o tesîr kerdî. Ma ke na roje ra ewnîyenê gelekî çîyî asan yenê la dînya tim sey ewroyîne nêbîya. 1928î ra ver dirbetêda qîce ver o merdimî merdênê. Dirbeta ke enfeksiyon girewt êdî felata merdimî çînî bê. 1928 de penîsîlîn keşî bi,

êdî verba bakterîyan antibiyotîkî amayê bikarardîş. Bifikirê, verê cû cengan de ê yê ke meydanê cengî de merdênê xora merdene la ê yê ke derba şîmşerî ver yan zî guleyê tîngî ver o birîndar biyînê na rey enfeksiyonî ver merdene. Hûmara ka enfeksiyonî ver o merdene yê meydanê cengî ra vîşer bî. Heta demeyanê peyênan zî merdimî nêweşîyanê sey sûrinca, tew, tîfo, kolera, wetaw ûsn. ver o merdene la ewro sayeyê terpîn û derzînan êdî derûdorê ma de nêweşîyê wina yînî nêmendê. Nînan ra teber êdî merdimî sey verî ceng nêkenê yan zî ez wina vaju, şeklê cengan vurîya. Cengê dinyayî yê dîyînî ra pey êdî cengêdê pîl nêvirazîya. Aktoranê esliyan xo meydanan ra ant. Nika hina zaf cengê wekaletî (proxy war) benê. Verê însanan seba erdî, seba ke yew mintîqa xo dest fino ceng kerdênê çünke o yo ke pere kerdênê erd bi. La nika çîyo ke erjê ci esto zanist o, teknoloji yo û nê zî bi cengî nêkewenê destê kesî.

## Problemê neweyî

Mi nê vurîyayîşî wina têrêze kerdî seke êdî çî problemê merdimîye nêmendê, her kes şa û bextewar o la belê çî heyf o ke raştîye wina nîya. Merdimîye êdî wayîra problemanê neweyan a, modernîteyî xo reyra prolemê neweyî ardî. Deraxa şabîyîşê merdiman ser o



anketî yenê viraştîş, netecîyê nê anketan zafane negatîf o. İstatîstîkê xokîştîşî roj bi roj zêdîyenê, êdî cengan ra vîşer merdimî bi xo, xo kişenê. Êdî şar goreba verê mordernîzmî hina bindest o, azadîya komelan binê talûkeyî de ya. Dewletî hina biyê otorîter, verba nê sistemanê otorîteran komelî hêza xo vîndî kenê. Tarîxê dînya da çî rey xoza henda ewroyî nêamebi îstîlakerdîş.

## Komelî xo newe ra saz nêkerd

Wina aseno ke seke zanistê pozîtifî şîyê aver, zanistê sosyalî, yê komelî xo înan nêresnayî. Belê dînya yew rey de vurîyaye la komelî verba nê vurîyayîşan de xo newe ra saz nêkerd, persê “cuyêda senîne” nêpersa yan zî cewabanê xo de qels mend. Sey heme ganîyan insan zî wazeno ke neslê xo dewam bikero, bizêdîyo. Na seserra peyêne de bi averşîyîşanê zanistîyan taybetî bi yê tibî reyde no waştîş ame ca. Nufus bi zaf la seba ke no nufuso gird têhet biciwîyo yew sistemo demokratîk û adil pironênîya. Seba sisteme kapitalîstî karkerê erjanî ameyê meydan, seba dewletanê militarîstan eskerî biyê vîş. Şarîstanî biyê gird, problemanê xo zî bi xo ya ardî.

## Karê dewletan kenê asan

Zanist şî aver însanan atom perçe kerd, no averşîyayîşî bi bom-

baya atomî, a bomba ameyê serreyê însanan de teqaye. Teknoloji şî aver, nika dewletî pê çekanê teknolojîkan gala şaran kenê. Teknik şî aver êdî insanî eşkayê awbendanê girdan virazê. Nika şima vînenê, ro nêmendê ke ser o awbendî nêameyê viraştîş. Medenîyet verê hemîn verê royan de pironîyayo, çî medenîyeto ke verê royan de estbi înan vîst binê awe. Awbendan ekosistemi vurîna, heywanê ke verê cû estbi nika nêmendê. İnsani verba nînan de nêşkayê a bomba vîndernê. İnsani nêşkayê vajê nê çekê ke ma bi teknolojiyê modernî viraZenê karê dewletanê kolonyalîstan kenê asan, pê nê çekan zulmê xo zêdnenê, şaran rê xedîr kenê, ma nê şaran nêverde rehma xedîrkaran. Yew aqîlo hempare nêvejiya ke vajo dînya ser o tena merdimî neci-wîyenê, ma hende nêşkenê xozayî îstîla bikerê. 70 serrî emrê merdimî esto, seba îxtîyacanê xo yê fuzûlîyan royanê milyon serrînan mirayneno.

Ma eşkenê vajê ke nê vurîyayîşî averşîyayîşî zafane simifanê iqtîdarî û serdestan rê xîzmet kerd. Çend şono iqtîdarî hina benê bihêz, verba iqtîdaran de komelî benê qels. Mi cor de zî vatbî, eke henda ke zanistê pozîtifî ever şîyê zanistê komelî yan zî sosyalî nêşerê aver merdimîye vîndî kena. Komelî mecbur ê ke verba nê iqtîdaranê gonîweran xo rêxistin bikerê, xo organize bikerê.

# Nêbeno ke sîyasetê paştîdayîşan bêro kerdene

Nevîn Alkan

Seke yeno zanayene 14 hezîrane de saet 17.24î de merkezê ci qezaya Kanîreşî ya Çewlîgî de bi şîdetê 5.9î de erdlerz qewimîya. Roja bîn reyna Çewlîgî bi girdîya 5.6î de teşîya. Reyna 16ê aşmî de merkezê ci qezaya Çêrme ya Çewlîgî de bi girdîya 4.3î de erdlerz qewimîya. Herême de varayîşo zêde yê varanî vera 18ê aşmî de qezaya Bongilanî de laser werîşt. Eynî roje Kanîreşî de varayîşê torge bi haywêkê xirabî tesîrê eraziye zîretî yê şarî û xeymanê mexdûranê erdlerzî kerd. Nê rojan de Homa her çî pêser pêser ano serê merdimîye. Pêroyê dînya Vîrusê Korona (Covid-19) ke bajarê Çînî yê Wuhanî de vejîya raştî reyde têkoşîn dana û ma zî tede. La

ma tena vîrusî reyde nê erdlerz, laser, hezaz, aşî (vewrê) û xeylê felaketanê bînan reyde têkoşîn danî.

Şarê herême badê erdlerzî varayîşanê tesîrinan de binê varayîşê de mend. Ban û awanîyê ke erdlerzê yewine de zirar dîyî, erdlerzanê bînan û varayîşanê tesîrinan de serûbin biyî. Şarê herême bê keye û war mend. Mexdûrîyetê şarê herême hema zî dewam keno û hetê dewlete ra gamêk cidî nêameyo eştene. Kesê ke hewl danî hetkarî bidî zî yenî astengkerdene. Yanî merdim fehm nêkeno ke seni rewşêka winasî de çîyayê dekeweno mabenê merdim û her tewir çîyayeyan.

No erdlerzî de zî çîyê ke erdlerzê Xarpêtî de qewimîyabî, qewimîyayî. Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Heyetê Rewşa Lezabeze awan kerde û

şî warê erdlerzî ke cigêrayîşî bikera, la hêzanê asayîşî nêverda ke heyetê HDPyî debikewo warê erdlerzî. Rewşanê winasîyan de çîyo muhîm oyo ke her çîyayeyan ra merdimî bibî yewî û pêro reng û çîyayeyî dest bidî yewbînan û hatkarîya yewbînan bikerî. Herînda paştîdayîşê merdiman de astengkerdîşê paştîdayîşan çîyêko wîdanî nîyo. Kam û çî beno wa bibo lazîmîya şarê herême bi paştîdayîşî esta û rewşanê winasîyan de reng û çîyayeyê paştîdayîşan çîn o. Kesê mexdûrî nêşkenî ferq bidekerî nê paştîdayîşan û ganî selahîyetdarî zî nê paştîdayîşan asteng nêkerî. Bi nê astengîyan hewl dîyeno ke şarê herême tena bêro veradayene û kamîya xo bêrî dîrkerdene. Xora çend hewte verê zî baş ame fehmkerdene ke herême de vîşerê zîhnîyetê xo te-

hemmulê tu çîyêk nîno kerdene û hêrişê gorîstan û goran ameybî kerdene. Her kes tewrê reng û çîyayeyan yewbînan qebl bikero vî-

şerê felaketanê xozayî tu problemêk merdimî nemaneno. Nêbeno ke sîyasetê paştîdayîşan bêro kerdene û ganî ma pêro yewbînan qebl bikerî.





**Dildarê Amedê**

**Rojeva koronayê**

Di nav van 2-3 mehên dawî de bi belavbûna nexweşiya koronayê re bandoreke mezin li jiyana hemû xelkê cihanê bû. Her welatekî li gorî xwe bi rêbazên cuda tekoşîna xwe li hemberî vîrûsê nexweşiyê bi pêş xist. Her gelê welatekî jî li gorî çanda xwe û serboriya xwe serî li rêbazên cuda da. Ez serê we neêşînim ez ê li vir behsa çend rêbaz û çirokên pêşgirtina belavbûna vîrûsê nexweşiyê li vî welatî û hin welatên din ên Rojhilata Navîn bikim.

**Sirke**

Di destpêka koronayê de hingî ku behsa feydeyên ava tîrî anku ava sihikê (sirke) kirin, êdî ji bêhna sirkê em nema karibûn di hundir de bimînin û tevî qedexeya derve me xwe davêt derveyî malê. Ji gava diya zarokan bihîstibû ku sirke vîrûsa koronayê dakuje, hemû hundirê xwe bi ava sirkê paqij dikir. Xwedê wekîl be ji bîna sirkê mal bûbû wek bîdona tîrşiyê.

**Kolonya**

Tiştêkî din jî yê gelekî reklama wê hat kirin kolonya bû. Digotin ku vîrûs demekê di qirka mirov de dimîne û mirov dikare wê bikuje beriya ku xwe berde nava kezebê. Îca li bajarê Êlihê camêrekî dikuxe û ditirse ev kuxik ya koronayê be, lewre li gorî wan gotegotan çareseriyê di vexwarina kolonyayê de dibîne. Şûşeya kolonyayê berdide ser qirika xwe û wî bi zorê digihînin nexweşxaneyê. Camêr jî tîrsa koronayê dikir ku bi kolonyayê jiyana xwe ji dest bide.

**Alkol û meya sexte**

Rastiya ku alkol dijminê vîrûsê ye jî li hin deveran bi rengêkî din hate bikaranîn. Jixwe li Îranê kirin û firotina vexwarina alkolê qedexe ye û kesên bi kar tînin bi dizî dikirin û difiroşin. Îca camêrekî ev fîrsend jî xwe re bi kar anî û alkol bi dizî firot û di encamê de 25 kes ji ber wê alkolê mirin, ji ber ku alkolê wî sexte bû.

**Mewluda sofî**

Sofî Silo jî ji destpêka koronayê de di dilê xwe de sozek dabû û wiha gotibû: Heke em bi silametî jî vîrûsê belaya koronayê xelas bibin, ez ê beranekekî bikim qurban û mewlûdekê bidin.

Îca dema nû dewletê qedexeya derve bi dawî kir ji wî werê ku nexweşî jî xelas bû. Ez serê we neêşînim 35 kesên hatibûn û xwarina mewlûda sofî xwaribûn tev bi koronayê ketin, ji ber ku sofî Silo bêyî bizanibe nexweş ketibû û bi destê kê girtibû ew jî bi xwe re nexweş xistibû.

Werhasilî xwedê dawiya me bi xêr bike. Desthilatdarî ji bo rewşa welatê wan a aboriyê xirabtir nebe û krîza heylî kûrtir nebe qedexeya derve hiltînin ji xelkê werî ku nexweşî bi dawî bûye. Lewre ev sistkirina qedexeyan li gelek ciyan rê li ber belavbûn û zêdebûna vîrûsê nexweşiyê vekir. De bi xatirê we û li xwe miqate bin heyra û xwe ji vîrûsê nexweşiyê bêbav baş biparêzin. Bi rastî jî metirsiya gelekî zêde belav biba heye û divê her yek ji aliyê xwe ve heta jê were xwe û derdora xwe biparêze.

# Harûn Reşîd û Behlûl

Di dema xîlafeta Harûn Reşîd de mirovek bi navê Behlûl hebû ku gelekî jîr û zana bû. Lê di nav gel de wekî Behlûlê Dîn jî dihate nasîn. Behlûl tu caran ji gotîna rastiyê xwe nedida paş û tîrsa wî jî ji kesekî nebû.

Behlûl heta ji destê wî bê mil-let ji xerabiyê dûr dikir. Hingî ku Behlûl rastî digotin û xerabî rexne dikirin, gelek kesên derdora wî ji Behlûl gelek aciz bûbûn. Mirov çûn ba xelîfe Harûn Reşîd û li Behlûl gilf kirin û jê re gotin: "Ey emîrê mumînan! Behlûl me pir aciz dike, têkilî her tiştê me dibe, lê tu dizanî ku her mî ji lingê xwe ve tê daliqandin, ji ber vê tu heqê wî tune

ye ku têkilî me bibe." Xelîfe Harûn Reşîd, bangî Behlûl kir û ew hişyar kir ku têkilî karên xelkê nebe û wiha jê re got: "Her

mî ji nigê xwe ve tê daliqandin û hemû kes cezayê xwe dikişîne, lewra nabe tu têkilî kesî bibî." Behlûl dengê xwe nake û ji


hizûra xelîfe derdikeve. Ji xwe re miyekê dikire û dibe mala xwe. Behlûl wê miyê serjê dike, nava wê diqelişîne û li hewşa mala xwe dadileqîne. Piştî çend roj derbas dibin, êdî bêhneke genî ji termê miyê tê. Derdor dîsa diçin ba Harûn Reşîd û giliyê wî dikin. Xelîfe dîsa gazî Behlûl dike û jê re dibêje tu doza çi dikî?

Behlûl wiha bersivê dide û dibêje: "Ya xelîfe! Ma we ne gotibû her mî ji lingê xwe ve tê daliqandin? Min jî miya xwe li mala xwe daliqand. Heger xelk ji vî bêhnê nerihet dibe, ez jî ji gunehên wan nerihet dibim."

Gelêrî



## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Keriyê bizin û miyan 3. Qada şer ya pêşî 5. Hêkên sipiyan.
6. Newaya razandina zarokan 7. Kêfxweş 9. Leşkerî
12. Peyayên bi wesayitan ji devereke diçin devereke din
14. Cînavkek pirhejmarîyê 15. Melekê mewtê, ruhstîn.
17. Sewaleke kedikîrî ya ji şîr û goştê wê tê sûdwegirtin 18. Bersiva neyênî
22. Paye, derece

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Sinif, jûra wanedanê
2. Gede, sebî 3. Pêvek 4. Rojeke hefteyê 5. Tayê ji hiriye hatiye çêkirin 7. Fedyok 8. Vexwarineke ji mast û avê çêdibe 10. Piyên sewalên wek ker û hespan 11. Sembol, nişane 13. Meheke salê 14. Asîmanî, li hin deveran li şûna zimani jî tê bikaranîn 16. Peywir, setra nivîsê, werisê ku kincên şuştî li serê tîrî xistin 19. Xwelî û tirafa binê agir 20. Zeviya mêmên tîrî 21. Daçekeke pir tê bikaranîn.
23. Cînavka kesê yekemîn a yekjimar.

**Bersiva hefteya borî**



# Navdarên kurd bi zarokan dide nasîn

Bêrivan Kayi

Nivîskar Yasemîn Elban ji bo zarokên kurdan fêrî çand, ziman û hunera xwe bibin, bi salan e nivîskariya çîrokên kurdî dike. Elban heta niha gelek pirtûkên çîrok û çîrvanok (Ecêbên Dinyayê, Ebas û Heblê, Asmîn û Bilbil, Carek Ji Caran, Destgulek Ji Zargotina Herêma Xerzanê) nivîsîne.

Der barê nivîsîna pirtûkên zarokan de nivîskar Yasemîn Elban ji rojnemaya me re axivî.



Nivîskar Yasemîn Elban ji bo zarokan seta ku ji 5 pirtûkan pêk tê amade kir û Weşanxaneya Darayê set weşand. Armanca nivîskar ew e ku zarok ji zimanê xwe hez bikin û paşeroja xwe nas bikin

Elban diyar kir ku tenê ne zarok, îro mezin jî navdarên kurd nas nakin û ji ber vê wê berê xwe daye nivîsîna çîrokên ku zarok paşeroja xwe bi wan nas bikin.

**Piştî wêjeya devkî wêjeya nivîskî**

Yasemîn Elban a li gundê Çor-sênê yê girêdayî Tetwana Bedlîsê hatiye dinê, diyar kir ku zarokiya wê tim bi guhdariya çîrok û çîrvanokan derbas bûye. Bavê Elban mele ye, ji ber vê yekê ew li gelek gundên Mûş, Wan û Bedlîsê geriyane. Herî dawî ji ber mercên siyasî û aboriyê, malbat koçî İzmirê dike û niha jî li wir jiyana xwe didomîne.

Elban da zanîn ku bavê wê di malê de axaftina tirkî qedexeyê kiriyê, ev yek ji wê re jî dibe minak û xwestiyê ku zarokên kurdan ji bi wê çandê mezin bibin û wiha got: “Bala min tim li ser wêjeya devkî ya kurdî bû.

Serê ewilî min çîrokên kurdî berhev dikirin. Dûvre jî tiştanok, zûgotinok, listikên zarokan û hwd. Ez bigi-haştama kîjan kurdê/a navsere,

min ji wan peyv ango çîrok digirt û dinivîsîn. Min gelek berhev kirin. Piştî vê yekê jî min dest bi vegotina çîrokên kir.”

**Xizmeta ji bo zimanê kurdî**

Nivîskar Elban dema ku dest bi vegotina çîrokên dîke, fikra ku êdî li wêjeya zarokan hûr bibe pê re çêdibe. Di serî de dosyeyêke bi navê teknîka ‘întak’ê ya ku eşyayan bi hev re dide axaftin, amade kiriye. Ev dosyaya ku ji heşt çîrokên pêk tê ji ber şert û mercên aborî nehatiye çapkirin. Her çîqas ev pirtûka wê nehatiye çapkirin jî Elban dev ji nivîsîna çîrokên bernade, her diçe ew bi kedekê mezin li bajarê İzmirê tev li perwerdeya zimanê kurdî dibe. Piştî fêrî gramera zimanê kurdî dibe, heta 9 salan li wir perwerdeya zimanê kurdî dide. Elban bi vî awayî her diçe li ser wêjeya kurdî xwe bi pêş dixê.

**Rojnivîska Xecê**


Elban piştî dixwaze ji bo zarokan berhemên navdarên kurd amade bike, dest bi nivîsîna ‘Rojnivîska Xecê’

dike. Ev seta ku ji Weşanxaneya Darayê derketiye ji 5 pirtûkan (Rojnivîska Xecê, Xecê li dû Derwêşê Evdî ye, Xecê li dû Mestûre Xanimê ye, Xecê li dû Evdalê Zeynikê ye, Xecê li dû Celadet Alî Bedirxan e) pêk tê. Elban der barê vê seta pirtûka xwe de bal kişand ser girîngiya hînkirina wêjeya kurdî ya bi zarokan û wiha got: “Xecê keçeke sêzdeh salî ye, ew her şev serpêhatiyên xwe xewn û xeyalên xwe di rojnivîska xwe de dinivîse. Di çîrokên de car caran rojnivîsk jî ji me re qala Xecê dîke. Ji bilî wê jî Xecê pir mereqdarê nasîna navdarên kurd e. Ev yek dibe sedem, ew di derheqê kîjan navdarê/î de lêkolîn bike, bi awayekî efsûnî ji roja me diçe serdema navdarên mîna Evdalê Zeynikê, Mestûre Xanim û hwd. dibe şîrikê derd û kulên wan û alîkariya wan dîke. Bi kurtasî min xwest bi rêya Xecê û rojnivîska wê, bi awayekî hêsan navdarên kurd bi zarokan bidim nasîn.”

**‘Zarok pêşeroja me ne’**

Nivîskar Elban di dawîya axaftina xwe de bal kişand ser berhemên nivîs-

karên kurd ên ji bo zarokan amade kirine û wiha diyar kir: “Roj bi roj em dibînin ku pirtûkên ji bo zarokan derdikevin, ev yek mirov kêfxweş dîke. Lê helbet ev tîr nake. Hewce ye hê zêdetir nivîskarên kurd girîngiyê bidin wêjeya kurdî ya ji bo zarokan, ji ber zarok pêşeroja me ne. Lê rastiyeke heye di nav nivîskarên kurd de, hin nivîskar berhemên hevdu naccibînin.”



Min herî dawî gotibû ‘Cegerxwîn êdî komunistekî nestêleye lew’ û derheqa komunistiya wî de gelek bend û nivîs hatine nivîsandin, her weha bi tenê li ser vê ranêzîkbûna wî ya mêjûyî, di saxiya wî de gelek hevpeyvîn jî pê re hatine kirin, yên ku exleb bîrdozîya wî derxistine pêş, wekî çawan veguheriyê û berê xwe –helbet wek wan– daye şewq û şemala ji Êrîsetê belavî cihanê bûyî. Lê ka haya Bolşevîkan ji wî hebû? Ji berhemdariya wî, ji helbestên wî, ji jiyana wî ya ji serî heta dawî xeht û koş, kefteleft û têkoşîn bû, hebû gelo? Ma pirtûkek ji wê şewq û şemalê para wî nîn bû? Ji *Nîşê Zivîn* ya edebiyata Sovyetiyê? Çi ku ji hingê ve–ji hinga ku dinya tep bûbû– çepgirên Kurd û Tirk pifî aqilê hev dikirin, herçî derdorên siyasî –wêjeyî– yên Roma Reş bûn, tenê di warê sosyalîzmê de dilê wan li helbest û helwêsta Cegerxwînî spî dibû, Seyda, wekî dibêjin, dilê wan bi savarê xweş kiribû, ew Cegerxwîn bû ku bi tu tehrî dargopalê xwe danenibû, Kurd bû û daw û doza yekîtîya Kurdan dikir, belkî zêdetir jî wê. Bixwe gotiye: “*Cara yekem e tîm girtin. Cara yekem e dibim bevalê komünistan û cara yekem e dibendî ketiye navbera min û malmêzînan... Hê jî nû ve min xwe da xu-*



**Weswese 2**

Şener Ozmen

## Çîroka evîneke utopîk: Cîm û Gulperî - II

*yakirin û rêça xwe da gubertin. Çûme ser oleke din û kevnepereştî bi şûn xwe ve hişt û gavên xurt û bêja ji bo welatparêzî û aştx-wazî û gerdenezadîyê bi pêş de avêtin.*

Li bihuştê (ango li Bêrûdê), li çaxaneyeke li qeraxa avê, du evîndar him çaya xwe vedixwîn û him jî ji xwe re –helbet ji xwe re çî ku ev gotin tenê di Kurdî de heye û weke hemû gotinên ku ihtimala şaştegihiştinê bidin der, alegorîk e û alegorî, wekî ku Paul de Mann jî dibêje, bi fi-gûran saz dibe û di esasê xwe de metafor in– li deryayê temaşe dikin. Rewşa avê gelekî bi wan xweş tê, ji her tiştî bêhtir, du mirovên jî elektrîkê çêkirî, dêhn û bala wan dikişîne, yên ku di qiraxa avê de bi şûr û mertalan tîn hev. Gulperî jî Cîmî dipirse;

– Heval tu nîzani ev çî ne?

Cîm, bersivê

didiyê;

– Ji elektrîkê çêkirine, lê ez jî nîzanim

ka ew çawa çêkirine.

Peyker in qey, gengaz e ku fena wan peykerên mekanîk yên di lûnaparqan de bin. Ne bi hindê peykera ‘*Alî û Nîno*’ ya peykersaza Gurcî Tamar Kvesitadzeyê çêkirî romantîk be jî (Alî û Nîno ya Kvesitadzeyê ya heft mîtro, ya ku qala ciwanekî Azîrbêcanî dîke, ku dil daye dotmîreke Gurcî, lê jî telebext re, di şerê weteniyê de jiyana xwe ji dest daye û bi miraza xwe şad nebûne. Peyker, evîna *Romeo û Jûlietê* dinimîne û gihiştina wan ji kompîturekê tê birêvebirin), bi temaşekirina wan re, daxwaza tiştêkî din di dilê Jûlietê me de peyda dibe. Di nav avê de xort û keçên rût û tazî ji xwe re melevaniyê dikin. Kelek û hûrgemî diçin û tîn. Bi gotina Cegerxwînî, ew jî kincên avê (*mayo*) li xwe dikin (di ser wan re hin kincên avê daleqandîne!) û çavên xwe li kelekvanekî digerin. Hingê xortekî bi navê Torin tîn wan, tîne dibêje;

– *Ma hûn sazbendekî nasxwazî, saz û naz li ser avê pir xweş in.*

Divê bibêjim ku ji bo xwendina *Cîm û Gulperîyê* (heye ku ji bo hemû bend û nivîsên alegorîk), seretayêke rast, yan reçete-yeke berdest nîne, çî ku dibêje Mann, hemû vebêje jixwe algorîk in, dawîya dawîn, vedigerin ser tiştêkî derî xwe. Mann vê xeht û koşê, bi ‘azara trajîk ya lengûstîkê’ bi nav kiriyê, xwendin çalakîyeke sermedî ye, naqede û ji bo çalakîyeke bêrade ye, her hewleke xwendinê, dê wateyine din li ser wateyên em wan fena heqîqeta vebêjeyê dibînin, zêde bike.

Cîmê ku her diçe der dasa xwe fireh dîke, vê carê doza ‘dengbêjêke

sazbend’ dîke, hebe baş e, Torin di cî de diçe û bîstek bi şûn de bi dengbêjêke ciwan re vedigere nik wan. “*Gulçîn dengbêjêke ciwan û zana û bejin zîrav û bilind, ne pir qelen; lê tîrgoşt û laşnîrm, tazî û çavbelek û gewr û lîvsor û diranzêr; porşeng û gulîbadayî, serê biriyaran ber bi rûdeman de berjêr dibû, cotên memikan li ser sîngê wek du bêkên kevan bilind bûbûn.*” Di vê beşê de gotinên ku derdikevin pêş ev in: “*Gulê kenî û got; Qey ez benî li vir jî heye beval*”, “*...bonjûroke zîrav û dirêj ji nav lîvên wê berikî û got*”, “*Em diçin, lê nîzanim bi ku ve diçin*”, “*ma ji îşev xweştir çî heye?*”, “*Ax jîn çî xweş e, îşev pir xweş e!*”, “*Kurd li dana xwe poşman nabin. Tiştê ko me da venagerî beval*”... Cîmê ku keyfa ser kelekê dîke, fena ku ji nişkê ve bi Rojhilatiya xwe hisiyabe, kirasekî teng yê sîncarêziyêke dirû li xwe dîke û rewşa Madam Gulçînê dinirxîne: “*Lê dilê min pîr pê dişewitî ku wê jinika ciwan û bêja ji bo peryan xwe xistiye vî rengî. Ev bemî sîc û gunebê Ewriþpayê ye. Em welatê Rojhilata Nêzîkê pîr li paş mane.*” Berî wê nîrxandina seyt, gotinên sosretir tîn; “*Çi qas xwe bi min şîrîn dikir; lê dilê min pê xweş nedibû. Ji ber ku dosta bi peryan yara ber kesî ye.*” Torin wan dibe otêleke Kurdan, ya rast Kurd û Eceman. Li ser derê wê *Mebmendar* nivîsiye, ango *Mêlvandar*. Hingê Cîm tîne dibêje; “*Jixwe em Kurd in, li otêla Kurdan digerin.*”, sibehê çaxa Torin tî otêlê, qala xweşiya xewa li Bêrûdê dîke ji wan re. Hingê em pê agahdar dibin wekî Torin jî Kurd e, Kurdekî jî Ekarê, hin dibêjin bi Selahedîn re û hin jî dibêjin bi Keykawîs re hatine û li Bêrûdê akincî bûne. Pîrs dîke Cîm wekî Bêrûdî jî wan xweş in yan na?

“*Belê, pîr ji me û bi me xweş in, li me dibîne xwedî. Lê em jî xwendinê direvin. Ji lew re tu dibînî em li ber derê bindest û belengaz in.*” Na na dîke Cîm;

“*... metirse Kurd nema dimirin, bêdî bêdî dîcînînin û ciwan radibin û pîr dimirin*” Pîrsa min jî ev e: Ka folklorî? Û ji ber çî gorbihuşt Mehmed Uzun *Cîm û Gulperîyê*, fena kurtçîrokeke dirêj û folklorîk bi nav dîke? “*Kovaran riyeke girîng, balkêş û nû li ber kurtçîroka Kurdî vekirin. Ji nivîskarên HAWARê Cegerxwîn, bi navê Cîm û Gulperî kurtçîroka xwe ya dirêj û folklorîkê di sala 1948’an de weşand.*” (Destpêka Edebiyata Kurdî, Uzun, r. 76) Çi ku –li gorî bir û boçûnên Uzunî, *Cîm û Gulperî* ne çîrokeke modern e, yan jî hin neghiştîye asta moderniyê, ji lewre peyva *folklorîkê* (di wateya kêm ditinê de helbet) bi kar anîye. Propp li hemberî wan pêşaneyên wehakîno radibe, ya ku folklorê, tenê di ser tewekekê civakê re dixwîne û pê re pê re li çanda gundîtiyê hûr dibe. Mijara lêkolanê ne bi tenê dardingî û arîşî ye (*spîritual*), mijara lêkolanê ne bi tenê gundîyê welatekî ye ku pîrî caran ev gundîyê wê lêkolînerê/î ye. Her çîqas di navbera cihana dardingî û arîşî de pêwendiyek hebe jî, divê jî hev bîn cudakirin û wek du qadên serbixwe bîn nîrxandin. Mesele kevnareya zîndewer e! Uzun, di pirtûka *Bir Dil Yaratmak* de (Afîrandina Zîmanekî), li ser pîrsa Ronî Alasorî (Tebax 2000) dibêje; “*... ya berî girîngî jî dengbêjên Kurd. Bêjî ku ez xwe bigihînim van çavkaniyan, zehmet bû wekî romaneke nîyan a Kurdî biafirînim. Çi ku hemû bedewî û dewlemendiya zîmanê Kurdî û wêjeya wê, di wan de veşartî ne.*” Di heman berhemê de li ser pîrsa Jean Claude Hussaisî jî dibêje; “*Divê em ji bir nekî ku edebiyata nîyan encax bi saya rabirdîyê pêk tê.*”

Bi gotinên James Joyceî biqedînim; “*...Birêz Goyert: Min bîna Ulysses Almani nedî. Min jî gotina ‘So sind sie in Dublin’ jî hema qet bez nekîr. Ev e nabebelwêsta min, heke bûbîya jî, dê bûbîya So sind wir in Dublin. Lê min jî berdayan jî bez nekîr. Heke Dûblînî ne pêkan be, In Dublin Stad yan Dublin an der Liffey çawa ye? Ji kerema xwe min agahdar bike...*”

<sup>1</sup>Li Dûblînê weha ne.  
<sup>2</sup>Em li Dûblînê wîlo ne.





## Koçberiya zaroktiyê

Berfê

Li wênêyê di destê min de qermiçiyê dinêrim; li çavê xwe yê di wênê de, ew wênêyê ku ji ber zaroktiya min mabû, li porê xwe yê xelekî, hinarokên xwe yê bêhna geyakî sêvan ji wan tê... Li peyvên di vî wênêyê de veşartî ne digerin. Peyv bi çavmîrînkê dilîzin bi min re. Ez çavên xwe digirim û peyv xwe vedîşêrin ji ber min. Dema ku çavên xwe bel dikim, awirên min li şeveke ku bi pîrwîran ronî dibe diterpilin. Peyv wînda dibin di wênêyê destê min de û rûyê zaroktiya min belawela dibe.

Ev ji kengî ve ye ez li ber wê behrê rûniştîme? Ji kengî ve ye pêlên wê ji rizdeya dilê min wer bûne û di bîra min de xeniqîne? Ev wênê ji kengî ve di destê min de ye û dewsa xwe di nivê destê min de xêz kiriye? Kî dizane bê min çend zarokanî derbas kirine û di çend wêneyan de min temenê xwe qetandiyê? Kî dizane bê min zaroktiya xwe di kîjan xatîrxwestinê de wînda kiriye?

*Keleqijîna havînê ye. Ji germa serê çûkan dişewite. Li gund ti kes nemaye, ji bilî me. (Mîna qulingên ji rêfên xwe qetiyane û ji koçê re dereng mane. Lê ev, derengmayîneke bi zanebîn e. Ne kêmasiyek e, ji ber wê ji wê ti lêborîn neyê xwestin.) Hemû firax û livînên me li qemyonê bar kirine. Kêfê kêfa min e ji ber ku ez ê li qemyonê sîwar bim û herim bajêr. Lê diya min û xwişkên min çima xemgîn in? Diya min çima digirî, gelo kesek miriyê? Xortekê radîbêje min û min datîne ser bêtên beşa me. Ji aliyekê ve rûyê min maç dike, bi min şa dibe li aliyê din ji rondîkan dibarîne. Ez ji kelogirî dibim, lê xwe digirim, nagirim. Berî nîba bi çend caran ew û bevalên xwe hatibûn mala me. Min ji wan pîr bez dikir. Îro ji hatibûn, ji bo ku me bi rê bikin. Qaşo yê mewan ew bûn, lê nîba ew dimînin û em diçin... Piştî kêlîyêke din hêstîrên çavên xwe paqîj dike, wênêkêşa xwe dide bevalê xwe û tê li cem min desikene... Çerqq!!!*


Wênê di destê min dikeve, ez vediciniqim. Xeyalên min, biranînên min serûbin dibin... Pêlên behrê bi qehr xwe li kevirên li ser rûniştî me dixin... Niha zaroktiya min bi kul e ji ber ku bişîrîneke revok hatiye û li ber lêvên min sekiniye. Ne diçe xwe li ser lêvên min datîne ne ji bi te-mamî dûr dikeve ji lêvên min.

*Rojêke tîrmehê ye firaxên me hemû li qemyonê bar kirine. Diya min, xwişkê û birayên min ji li dolmîşê sîwar bûne. Lê min destê wî xortî girtiye, naxwazim destên wî berdîm. Min zanibû ku ez berdîm de her tim destê min vala bimînin. Ez ê edî qet nema kearîm bi destê yekî din bigirim. Ku ji destê wî qut bibim ma ez ê bê welat nemînim?*

Wênêyê di kefa destê min de qermiçiyê, zaroktiya min di hundirê xwe de hewandiyê û li min dinêre niha. Ew zarokê rûgeş li ser sirgûniya min hêstîran dibarîne û li ser ciwaniya min a ku demekê di xeyalên wî de şîn bûbû. Ew lehengê li cem ê xeyalên xwe yê mîna welatekî giran avêtine ser milê xwe û rondîka xwe ya dawî di nav mijgulên xwe de hiştîye, dibêşe bi min re. Kenek li nivê rê maye, ji paşeroja min û stranek ji teyibeke dilşikestî li serê baniyekî ji axê:

*"Koçan bar kir, ez mame li waran  
Ne gazî ne qerîn ne şîxan û  
bewaran..."*

# Zozan û koçerî



Adar Şaman

Koçer jiyana bi xwezayê re xwezayî û pîroz dibîn. Di çanda koçeriyê de xweza pîroz e. Ji xwezayê û zimanê xwezayê fêm dikin. Bêyî ku zirarê bidin, jê sûd werdigrin. Jiyana wan bi avûhewa, çiya, dol û geliyan re bûye yek

Peyvên koçer, koçberî, kon, eşîr, êl û kurd weke goşt û neynûkê bi hev ve ne. Bi gotineke din, weke hesinê lihêmkirî ne.

Koçerî di dîroka kurdan de, wek serdema civakî ya herî dirêj û qedîm tê zanîn. Beriya gund bîn avakirina û mirov bibin niştecih, civak û komikên mirovan bi awayê koçeriyê dijîyan. Li gorî debar û pêdiviyên xwe car hebû koçerî dikirin car hebû ji bi cih û wan dibûn, li gundan dijîyan. Dîyalektîka jiyana koçeriyê, liv û tevgera li gorî şert û mercên xwezayî ye. Êl û eşîrên koçeran her tim rastî êrîşên serdestan dihatin.

Piştî darbeya lekerî ya 12'ê Îlonê, desthilata cûntayê bi qanûnên teybet û zorê koçer ji cih û warên wan, çiya û zozanan qut kirin. Ji wê demê şûn de, koçer neçarî jiyana demborî hatin kirin. Derketina zozanên koçeran, li koçeran hatin qedexekirin. Koçer, bi darê zorê li gund û bajaran neçarî jiyana xwecihî kirin ku edî nikarîbin koçeriyê bikin. Ev zext û êrîş her diçe, zêde dibin. Îro dîsa, di bin navê "zozanên qedexe!" destûr nadin ku koçer biçin zozan, çiya, gelî û newalên xwe. Koçerên ku ji ber wê rewşê neçar dibin û berê xwe didin ser rêya zozanên xwe, ji hêla artêşa tirk û cerdevanan ve rastî îşkence, destgîrîkirin û girtinê tînin. Dest datînin ser keriyên pezê wan û alavên wan ên

debara jiyane ne.

Bi demê re civaka koçeran neçarî jiyana demborî hat kirin. Êl û eşîrên kurdan ên koçerî dikirin, hînî jiyana li ser çiya, gelî û zozanên hênîk ên bê sînor û xwedîkirina sewalan bûbûn. Îcar, îro desthilata rejîma tirk, ev dever li koçeran qedexa kirine û destûr nade ku biçin zozanên xwe.

Ji ber van polîtîkayên qirkirinê û zilma tînin kirin, sewalvanî li Kurdistanê li ber tunebûnê ye. Koçer ji-

sînor tune bûn. Koçer, çiya û zozanên ku diçûnê, bi xwe re çand, xeyal, hest û nasnameya xwe ji dibirin. çiya û zozanan pê dineqîşandin. Li deşt, çiya û zozanan, şopên dîroka koçeriyê bi qasî temenê hebûna mirovahiyê kevn e.

Zozanên Qerejdag, Agirî, çiyayê Sîpanê, Cûdî, Nemrûd, deşta Faraşînê û çiyayê Cîlo meskenê koçeran ên her demsalên biharê bûn. Merg û kanî, di bin serweriya wan de bûn! Deşt û zozanan bi konên reş û derûdorê konan jî, bi rengê sor, şîn, helesorî û zerxemrî li ber tîrêjên rojê dibiriqîn. Ev reng bi keskayîya xwezayî re, dibûn yek û ahenga rengan bedewtir dikir.

Koçerî; hîskirina hebûna rengên xwezayî û jiyana bi giyana xwezayî ye. Civaka koçeran, civakek xweser û bi xwe bawer e. Ji xweza û xwezayîbûna xwe razî ne. Jin, zarok û zilam herkes bi cilên xwe yê herêmî û neteweyî bejn û bala xwe dixemilandin. Motifên neteweyî, awazê bilûra şivanan, teşiyên dapîran, honandina bi xemla tayê heftrengî û zarokên gulî morîk kirî bi cilên li ber tava zozanan qîçîkbûyî û porên bêhna sabûna kizwanan jê dihat li ber bayê zozanan diket. Bêhna axa çiyê diket rengê cilên koçeriyê! Destên wan li ber ava cemidî diterikîn.

Koçeran warên xwe li gorî pêdiviyên demsalê vediguhastin. Her çiqas geştîyarî bi xwe re zehmetiyên jiyani tanîn jî, ew edî bûbûn çanda koçeriyê. Koçer, her roj bi berbangê re radibûn kar û barên xwe dikirin, alavên pêdi-

viya rojane bi wan çêdibû û qûtê heyî datanîn ser piştî qatîr-hespan û diketin rê. Qonax bi qonax bi mehan di rê de diman heta ku diçûn bineciha xwe. Salê du caran, dibûn rêwiyên rêyên dirêj û ev bi wan xweş bû; çûna zozanan û hatina deştê.

Têkiliyên civaka koçeran ên navxweyî, xwezayî û li ser bingeha zibarê alîkariya hev dikirin. Di karê mihbirîn, berxbirîn, malbarkirin û konvedanê de, diçûn hewara hev. Ev li cem koçeran, kevneşopiyek bû. Koçer, civakek mert û mêvanperwer û esil in! Serhildêr û xwezayî ne.

Koçer gelekî qîmet didin sewalan û xwedîkirina wan. Hemû dema wan bi xwedîkirin, dotin û alîfkirina sewalan diborî. Dizanin ku kîjan nebat-giya merg û çîmen şîrê pêz zêde dike.

Mala koçeran, konê reş bû. Konê reş, ji mûyên bizinên reş çêdikirin. Bi teşiyê di honandin û bi tevnê dikirin merşên dirêj. Ew parçeyên merşan bi hev ve didirûtin û dikirin konê reş. Mezinahiya konan, li gorî nîfûsa malbatê û hejmarê sewalan dihat çekirin.

Îca koçerî, li gorî dozdeh mehên salê vediguhazî. Zehmet be jî, mayîna koçeran li çiya û zozanan bi wan xweş û şahî bû. Mayîna Koçeran, li deşt û gundan, demkurtî bû. Koçerî bi zozanan, zozan jî bi koçeran dixemilîn.

Erê, îro zozan "qedexa ne." Çanda koçeriyê, li ber tunebûnê ye. Warên koçeran, hatine wêrankirin û koçer li bajaran neçarî hemaliyê bûne. Bêdaletî û zilmek mezin, li ser çanda koçerî û koçeran tî kirin. Koçerî li zozanan xweş e!



yana bi xwezayê re xwezayî û pîroz dibîn. Di çanda koçeriyê de xweza pîroz e. Ew ji xweza û zimanê xwezayê fêm dikin. Bêyî ku zirarê bidin, jê sûd werdigrin. Jiyana wan bi avûhewa, çiya, dol û geliyan re bûye yek; di serpêhatiya koçeriyê de bi wate dibe. Hecîka koçerî, girêdana wan a êlî, eşîrî û kesên merivên hev in, ango ji xwîn û goştên hev in bi hev ve girêdayî ne. Ehlak û pîvanên çanda civaka xwezayî bi awayê orjînal dijîyan. Di hiş û bîra çanda koçeriyê de,